

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatolîyê

94
2025

bîrnebûn





Tidskriften utkommer 3 nummer per år.
Çar mehan carekê derdikeve.
Utges av Apec Förlag AB
hejmar 94/ 2025
Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi
Editor: Ali Çiftçi, Heciyê Gulê, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê:
Ali Çiftçi, Adem Özgür, Altun Başaran, Muzaffer Özgür,
Prof. Dr. Haci Akman, Rohat Alakom, Malmime, Zaze Mahabadi,
Şefîq Pêşeng, Arvin Abdollahzadeh Mehtab Îdeli, Xizan Şîlan, .

Belavkirin / Distribution:
Ewropa: Muzaffer Özgür
Bîrnebûn
Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya
Tfn: 0049-172 298 24 51

Numra kontoya li Swêdê:
(Bîrnebûn) bankgiro: 402-2224
Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê
APEC, "Bîrnebûn"Bankgiro-Stockholm/Sweden
BIC/SWIFT: DABASESX
IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874
Çap / Baski: Apec-Tryck AB

Biha/Pris:
Europa: 5 Euro
Türkiye: 30 TL
Abone ji bo du salan
Swêd: 400 SEK -Almanya 50 Euro
Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Medya Kitapevi
Bekar Sokak No: 7, Giriş kat.
Beyoğlu / İstanbul / Türkiye

Adress
Navnîşana li Swêdê
Apec
Mjölmarstigen 1
SE 163 41 Spånga/Sverige
E-post: info@apectryck.se
Internet: www.birnebu.se

Her nivîskar bersive nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tîn,
sererast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwediyên
nayên vegeandî. Ji ber stîl û devokên taybet em
dest nadin hinek nivîsên nivîskarên xwe.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û
Komela Zîman li Almaniyayê piştgirên kovarê ne.

Wêneyên bergê: j.....n.

bîrnebûn 94

2025

ISSN 1402-7488

bîrnebûn 93/2025

Naverok

<i>Ji Bîrnebûnê</i> , Alî Çiftçî.....	6
<i>Sê ciwanên kurd ên ji Konyayê xelat wergirtin</i> , Adem Özgür.....	7
<i>Ji gundên Anatoliya Navîn ber bi şaredariyên Danîmarkayê</i> , Adem Özgür.....	10
<i>Pêşangeha Kitêbên Kurdî Stockholm</i> , Alî Çiftçî.....	12
<i>Li ser Mem Xelîkan Kilameka şîmê</i> , Altun Başaran.....	18
<i>Meçit</i> , Seyfi Doğan.....	19
<i>Sewrikê Xelîkan</i> , Altun Basaran.....	20
<i>Mem Xelîkan</i> , Seyfi Doğan.....	22
<i>Mem Xelîkanê Derya-Dil</i> , Rohat Alakom.....	24
<i>”Ser mor û kilamên şîmê”</i> Malmime.....	29
<i>Derbarê dîroka kevnar a nexş û xemlên berik û beriyên kurdan de</i> , Zaze Mahabadî.....	36
<i>Kulîlka çîlmisî</i> , Arvin Abdollahzadeh.....	41
<i>Qirfo</i> , Seyfi Doğan.....	44
<i>Şarruma û mîrîsa ruhî ya çiyayên Kurdistanê berdewam e</i> , Zazê Mahabadî.....	45
<i>”Testa genetîkî got bi xudê tu kurd î!”</i> , Mehtab Îdelî.....	51
<i>Hişmendiya bêdewletî – Hişmendîya kolektîf</i> , Professor Haci Akman.....	57
<i>Helbest</i> , Seyfi Doğan.....	61
<i>Rêwîtiya ber bi welatê xerîbîyê</i> , Adem Özgür.....	62
<i>Yek bo min yek bo te</i> , Şefîq Pêşeng.....	67
<i>Xemên sar</i> , Xizan Şîlan.....	73
<i>Dîroka hunera tevnê, xali û kurd -IV-</i> , Muzaffer Özgür.....	74

Rojhilata Navîn di rewşeke nû de ye. Kurd li ber şertên nû: Derfet an jî dîsa qurbanî?

Ji perspektîfa siyasî, çandî û diasporayê

Rojhilata Navîn di sedsala 21an de dîsa li ber guherandinên bingehîn e. Şer, şertên jeopolîtîk yên nû, bêhêzbûna dewletên kevn û derketina aktorên herêmî û navneteweyî, şertên herî girîng ên ev herêm afirandine.

Di nav vê rewşê de, kurd ku bi sedsalan bêdewlet mane, niha dîsa li ber şertên dîrokî ne. Pirs ne tenê ev e ku şert çi ne; pirs herî girîng ev e ku **kurd di vê rewşê de çi dikin û divê çi bikin?**

Kurd di siyaseta Rojhilata Navîn de wek aktoreke siyasî

Piştî şerên Iraqê û Sûriyê, kurd di siyaseta navneteweyî de ne tenê wekî pirs etnîkî, lê wekî aktoreke siyasî û leşkerî hate nasandin. Tecrûbeya xweserîya siyasî li Başûr û Rojava bi awayekî vekirî nîşan dan ku kurd dikarin şertên xwe bi destê xwe biafirînin.

Sînoren vê nasînê

Ev nasîn, heke bi stratejiyeke demeka dirêj, yekîtî û xwedîderketina neteweyî neyê piştgirîkirin, dikare bi hêsanî bê windakirin. Dewletên herêmî hîn jî bi refleksên înkarkirin û têkberinê hereket dikin.

Derfetên dîrokî

Guherandina şertên herêmî derfeta ku kurd ji bo cara yekem li nav şertên ku dikare xwe wek mîmarê şertên xwe bibîne, derketin holê. Diplomasî, medya û civaka sivil şertên herî girîng ên vê qada nû ne.

Xetereyên rastîn

Bêyî yekîtî û bêyî plan, ev derfeta na dikarin bibin xeter. Cûdahiyên partîyan, herêmî û îdeolojîk hêza kurd lawaz dikin û şertên dijminan bi destê xwe hêsan dikin.

Yekîtîya neteweyî

Yekîtîya li ser bingehên berjewendîya giştî şert e. Cûdahiyên

partî û herêmî, heke li ser hesabê berjewendiya giştî nebin, kurd bêhêz dibin. Cûdahiyên ku li dijî vê yekîtîyê ne, kurdan bi hêvîya şertên nû re dûr dixin.

Ziman û çand wek bingeh

Ziman û çand divê bibe navenda siyasî. Neteweyek ku zimanê xwe di perwerdeyê, medyayê û zanîngehan de bi kar neyne, li derveyî siyaseta cihanî dimîne. Ziman û çand ne tenê hebûnên folklorîk in, ew hebûnên siyasî ne.

Siyaseta demdirêj

Kurd divê ji siyaseta reaksiyonî derkeve û bi plan, zanîn û stratejiyeyeke dûrûdirêj hereket bike. Perwerde û avakirina hêzên zanistî şertên sereke ne.

Dîyaspora kurd li Ewropayê

Ewropa ji bo kurdan şertên azadiya gotin, nivîsandin û rêxistinê peyda dike. Ev şert dikarin bibin bingehên avakirina platformên çandî û akademîk. Lê ev azadî bi xwe xwe neparêze eger em wek kurd xwe di qada çandî û perwerdeyê de bi rêxistinê nekin.

Asîmîlasyon û pirsgirêkên nifşên nû

Bi van hemû derfet û şertên re jî, asîmîlasyon xetereyê mezîn e. Pîraniya zarokên kurdan li welatên Ewropayê kurdî fêm nakin an jî bi xwendin û nivîsandina kurdî re girêdayî nabin. Ev ne tenê pirsgirêka malbatî ye, ev pirsgirêka neteweyî ye.

Rola kovarên çandî

Kovarên çandî divê ne tenê cihê nostaljiyê bin, lê bibin navenda ramanên nû, rexne û têgihiştinê. Ew divê pira têkiliyê ya navbera welat û dîyaspora ava bikin û rêbidin dengê nifşên nû.

Encam

Rojhilata Navîn dîsa tê avakirin. Di vê avakirina nû de, kurd dikare bibe aktoreke sereke û mîmarê şertên xwe, an jî dikare dîsa bibe qurbanê şertên ku bi destê dijmin têne afirandin. Ev şert bi hêzê tenê nayê guhertin, lê bi **yekîtî, hiş, ziman, çand û zanîne** tê guhertin.

Kovara Bîrnebûnê

Bîrnebûn wek kovareke hunerî, çandî û lêkolînê ya kurdên Anatoliya Navîn, bi armanca berhevkirin û parastina bîra civakî ya kurdan

derdikeve. Ev kovar hewl dide ku di navbera kevneşopî û nûbûnê de pireka bi bîr û zanînê çêbike, dengê çanda kurdî ji dûr û nêz ve bide bi-hîstîn û wê bi pêşerojê vê girê bide.

Di vê hejmarê de, xwendekar dê bi rêzek nivîsên nû yên cuda re rû bi rû bibe; nivîsên ku bûyerên nû li welat û derveyî welêt dibin, ji kevneşopî û folklorê kurdan bi awayekî zanistî û çandî lêkolînê dikin, her weha rewşa kurdan a li diyasporayê bi çavê tecrûbe û têgihîştinê radixin. Di nav wan de çîrok û helbest jî cîh digirin ku bi zimanê hunerî bîr û hestên civakê vedibêjin.

Em bawer dikin ku bîr û nasname bîyî nivîs û berhevkirinê nayên domandin. Ji ber vê yekê, ev kovar dixwaze bibe qada hevpar a nivîskar, lêkolîner, hunermend û xwendekaran ku li ser çand, ziman û jiyana kurdan dixebitin. Em hêvîdar in ku ev hejmar jî wek yên berê, hem li ser asta zanistî û hem jî li ser asta çandî, bibe platformeka girîng ji bo bîra me ya hevpar.

Adem Özgür bi sernivîsa *Sê ciwanên kurd ên ji Konyayê xelat wergirtin* xeber li ser sê ciwanên me nivîsiye. Bi xalatwergirtina van hersê ciwanan em serbilind in.

Xebera hilbijartinên şaredarî û herêmî yên Danîmarkayê ku di 18ê payîza paşîn 2025an de bû, dişan ji pênûsa Adem Özgür bi sernavê *Ji gundên Anatoliya Navîn ber bi şaredariyên Danîmarkayê* hatîye nivîsîn. Em bi vê xebata ciwanên me yên li Danîmarkayê jî serbilind in. Pêşketin û serkeftina wan pîroz dikin.

Malmime bi sernivîsa *"Ser mor û kilamên şînê"* Kevneşopiyeke hevpar a şînê hevpar ya başûrê welêt û ya kurdên Anatoliyayê daye berhev.

Arkeolog, Zaze Mahabadî di derbarê bîra kevnar de bi sernivîsa *Derbarê dîroka kevnar a nexş û xemlên berik û berîyên kurdan* de li ser şeramîkên kevnar yên di nav Zagrosan de hatine dîtîn lêkolaye.

Ev hejmar jî dişan ji nivîs û lêkolînên ji hevkarên me yên tîn nasîn ve hatîye dagirtin.

Bi hêvîyên jîyaneka aram û ev derfetên nû ku li herêmên kurdan peyda bûne ji bo xelkê me bi silametî be, sala nû li we hemûyan pîroz be. Heta hejmara bê bimînî di xêr û xwaşiyê de.

Alî Çiftçî

Sê ciwanên kurd ên ji Konyayê xelat wergirtin

Adem Özgür

Ji Konyayê sê ciwanên kurd bi karên xwe yên hunerî û rojnamevanî xelatên girîng qezenc kirin. Zagros Çetinkaya bi sînemayê, Adem Özgür bi rojnamevaniyê û Doğan Yıldız bi filmeke kurt a bi telefonê çêkirî, her yekî bi rêyeke cuda çîrokên xwe vegotîn û serkeftineke mezin bi deşt xistin.

Zagros Çetinkaya

Fîlma kurt a kurdî ZERYA, ku li Norwêcê hatiye çêkirin, di 59emîn Festîvala Navneteweyî ya Fîlman a WorldFest-Houstonê de xelata taybet a juriyê wergirt.

Derhêner û senarîstê filmê Zagros Çetinkaya, bi vê xebatê

ji çîrokeke rastîn dest pê kiriye û mijarên koçberiyê, bîranînan û lêgerîna nasnameyê anîne zîman.

Çetinkaya wiha dibêje: «ZERYA ne tenê çîrokeke; ew têkoşîna mirovî ye ku nasnameya xwe dîsa bibîne. Ez vê xe-



latê pêşkêşî şervanên jin ên cîhanê dikim. Em ê cesaret bikin ku di tariyê de bimeşin. Ji bo bîranîna hemû kesên ku di rêya xeyalên xwe de bi trawmayê jîyana xwe ji dest dan...»



Çetinkaya li gundê Xelikan (Qerejdax, Konya) ji dayik bûye û perwerdehiya huner û sînemayê li Norwêc û Swêdê wergirtiye. Piştî salên dirêj rojnamevaniya serbixwe kir, dîsa vegeriya sînemayê.

Niha li ser filma xwe ya nû Ezmanê Ax dixebite.

ZERYA di mehên pêş de dê li festîvalên Ewropa û Rojhilata Navîn were nîşandan.

Adem Özgür

Encama pêşbirka 32emîn “Xelatên Rojnamegeriyê yên Mûsa Anter û Şehîdên Çapemeniya Azad” hate ragihandin.

Di beşa Tirkî de, jurî xelata yekemîn ji Bir+Bir Expressê dane nivîsa Adem Özgür a bi ser navê “Rêwîtîya Ber Bi Welatê Xerîbîyê”.

Juriyê got: “Adem Özgür çîroka xwe bi tevgera koçberiya cîhanê re girê daxe û bi ziman-

ekî sade nivîsandiyê. Ev kar hem ji bo navê Mûsa Anter û hem jî ji bo rojnamevaniya pîşeyî karekî girîng e.”

Adem Özgür li gundê Celika (Yeşilyurt, Konya) ji dayik bûye. Li Zanîngeha Selçukê beşa Radyo, TV û Sînemayê xwendiyê. Ji sala 2014an ve di kovara Bîrnebûnê de dinivîse.



Li BasNûçe û Kurdistan24ê wek rojnameger û edîtor xebitîye. Nivîsên wî bi kurdî, tirkî, hollandî û îngilîzî tên weşandin. Niha li Hollandayê dijî û wek rojname-gerekî serbixwe kar dike.

Doğan Yıldız

Fîlma komêdiyê ya kurt ‘Communication - Ragihandin’, ku

Doğan Yıldız ji gundê Kelhasan (Konya) bi telefonê xwe çêkiriye, li gelek festîvalên navneteweyî xelat wergirtine.

Doğan Yıldız dibêje: “Ev xelat ne tenê yê min in; ew serfira-ziya hemî heval, xizm û akra-bayên min ên ku bi min bawer kirin. Ez kêfxweş im ku vê şahiyê bi we re parve dikim.”



Xelatên wergrî:

New York Movie Awards / Fîlma Herî Baş a Zêde Kurt

New York Tri-State / Fîlma Mîkro ya Herî Baş

Jersey Shore / Fîlma Navneteweyî ya Herî Baş

Florence Film Awards / Xelata Zîn a Komêdiyê

Bridge Fest Vancouver / Fîlma Telefonê ya Herî Baş

Folkestone Film Festival / Xelata Fîlma Kurt a Herî Baş

Van sê ciwanên kurd bi hunera xwe ne tenê xelat wergrîtin, lê di heman demê de çîrokên gelê xwe û têkoşîna mirovî li cîhanê belav kirin.

Ji gundên Anatoliya Navîn ber bi şaredariyên Danîmarkayê

Adem Özgür

Li Danîmarkayê di hilibjartinên herêmî de 27 kurd hatin hilibjartin û ketin meclîsên herêmî û şaredariyan.

Di hin şaredariyan de ji yekê zêdetir kurd hatin hilibjartin. Li şaredariyên Albertslund û Ishøj sê kurd bûne endamên meclîsê. Her du şaredarî jî li nêzî Kopenhagê ne.

Piraniya endaman kurdên Anatoliya Navîn in.

Li Albertslund: Hediye Temiz (Çepa Radîkal), **Resul Küçükakın** (Partiya Gel a Sosyalîst) û **Doğan Polat** (Sosyal Demokrat)

Li Ishøj/Vallensbaek: Murad Kütük (Sosyal Demokrat), **Sami Deniz** (Partiya Gel a Sosyalîst) û **Erdal Çolak** (Sosyal Demokrat - Vallensbaek)

Li København (Kopenhag): Lars Aslan Rasmussen û **Yıldız Akdoğan** (her du jî Sosyal Demokrat)

Nav û Partî:

Serdal Benli - Partiya Gel a Sosyalîst, Şaredariya Gladsaxe

Gül Özcan - Lîsteya Yekîtiyê, Meclîsa Herêma Hovedstaden

İbrahim Benli - Lîsteya Yekîtiyê, Şaredariya Herlev

Erdal Çolak - Sosyal Demokrat, Şaredariya Vallensbaek

Sami Deniz - Partiya Gel a Sosyalîst, Şaredariya Ishøj/Vallensbaek

Selim Baran - Lîsteya Yekîtiyê, Şaredariya Glostrup

Taner Genç - Partiya Gel a Sosyalîst, Şaredariya Ballerup

Fatih Baran - Lîsteya Yekîtiyê, Şaredariya Brøndby

Fırat Sarı - Partiya Gel a Konservatîv, Şaredariya Vallensbaek

Araz Xan - Hevpeymaniya Lîberal, Şaredariya Odense

Cömert Sonsuz - Sosyal Demokrat, Şaredariya Fredensborg

Doğan Polat - Sosyal Demokrat, Şaredariya Albertslund

Eset Şentürk - Çepa Radîkal, Şaredariya Hoje-Taastrup

Hediye Temiz - Çepa Radîkal, Şaredariya Albertslund

Hüseyin Araç - Sosyal Demokrat, Şaredariya Aarhus

Mehmet Zeki Doğru - Lîsteya Yekîtiyê, Şaredariya Greve

Metin Deniz - Sosyal Demokrat, Şaredariya Hillerød

Murad Kütük - Sosyal Demokrat, Şaredariya Ishøj

Musa Harmancı - Partiya Gel a Konservatîv, Şaredariya Furesø

Mustafa Aslan - Sosyal Demokrat, Meclîsa Herêma Midtjylland

Necla Baran - Lîsteya Yekîtiyê, Şaredariya Rødovre

Resul Küçükakın - Partiya Gel a Sosyalîst, Şaredariya Albertslund

Roza Süleyman - Sosyal Demokrat, Şaredariya Aalborg

Yavuz Sarı - Sosyal Demokrat, Şaredariya Guldborgsund

Özgen Yücel - Partiya Çep, Şaredariya Hillerød

Lars Aslan Rasmussen - Sosyal Demokrat, Şaredariya København

Yıldız Akdoğan - Sosyal Demokrat, Şaredariya København

Her wiha Fatih û Selim Baran birayên hev in, Necla jî dotmama wan e; her sisê wan jî serfiraz bûn û li şaredariyên cuda dê bixebitin.

Ji bilî Roza Süleyman (ji Şengalê) û Araz Xan (ji Zaxoyê), namzetên din ji Tirkiyeyê ne.

Serkeftina Serdal Benli

Benli ji gundê Bumsuzê (girêdayî navçeya Haymanaya Enqereyê) di hilbijartinên herêmî yên Danîmarkayê de serkeftineke dîrokî bi dest xist. Benli, wek namzetê Partiya Gel a Sosyalîst (Socialistisk Folkeparti) bû Serokê Şaredariya Gladsaxe. Gladsaxe şaredariyeke bi 70 hezar niştecihan e û li bakurê Kopenhagê ye. Ev serkeftin ji bo

Kurdên li diasporayê wek mînakeke girîng tê dîtin û nîşan dide ku Kurd dikarin di siyaseta herêmî de cihên girîng bi dest bixin. Benli li ser serkeftina xwe wiha got: “Bêguman ev xewnek e. Ez salên dirêj di siyaseta de me.”

Benli kî ye?

Benli di sala 1979an de li Bumsuzê ji dayik bûye. Di sala 1988an de bi malbata xwe re ji Tirkiyeyê koçî Danîmarkayê kiriye û li wir bi cih bûye. Benli xwendina xwe ya bilind li Zanîngeha Roskildeyê temam kiriye û di sala 2005an de dîplomaya xwe ya Zanistên Civakî û Ragihandinê wergirtiye. Di sala 2003an de bûye endamê Partiya Gel a Sosyalîst. Di sala 2019an de wek cîgirê serokê giştî yê Partiya Gel a Sosyalîst hat hilbijartin û heta sala 2022an vê erkê bi cih anî. Niha jî serokê Statsrevisorerne (Kontrolkarên Dewletê yên Danîmarkayê) ye. Bi vê serkeftina dawîn, Benli bû yekem şaredarê Kurd li Danîmarkayê.



PÊŞANGEHA KITÊBÊN KURDÎ

Stockholm

Wêşanxaneya APECê pêşangeheka kitêbên kurdî bi hevkarîya ABF-Stockholm, kovara Bîrnebûn, YNKS, Kitêbxaneya Kurdî, û weşanxaneya 49Books li Stockholmê di 22 -23ê payîza paşin 2025an da pêk anî.

Du rojan, li pêşangeha kitêbên kurdî li avahiya ABFa li Stockholmê bi dehan nivîskaran kitêbên xwe dan nasandin. Di pêşengehê de Ronî Çiftçî jî ji bi hunera xwe diwarên salonê xemilandin.

Di pêşengehê de, herdu rojan jî program hebûn. Li gel nasandina berhemên nû yên salê li ser dîyasporeya kurd, wêjeya kurdî û çawa em dikarin ciwanên kurd teşwîq bikin ku bixwînin û binivîsin, malbat û rêxistinên kurdan çing dikarin zanîne li ser girîngiya wêjeya kurdî belav bikin, hat dengkirin.

Beşdar û mêvanên pêşengehê di van herdu rojan de bi awayekî aktîf nerîn û şîrovevên xwe anîn ziman, bi gotêbêjan ve program di atmosferek germ de hat dew-

lementkirin. Em hêvî dikin ku em vîya bikin edet û her sal pêk bînin.

Me herwiha di vê pêşengehê de helbestwan û hevkarê kovara me, Bîrnebûnê Dr. Mem Xelîkan jî bibîranî.

Li ser navê kovarê Altun Başaran û Seyfî Doğan deng kirin. Di bîranîna Dr. Mem Xelîkan de keça wî Helîne jî axaftinek kir. Altun Başaranê di vê bîranînê de kilameka şîne jî li ser Mem Xelîkan got.



Bi sinevîsyonê, ji dengê Mem Xelîkan bi xwe me guhdarêya helbestên wî kir.

Gotina dawî ji weşanxaneya APECê ve bû û malavayî li beşdaran hat kirin.

ÇEND DÎMEN JI PÊŞANGEHA KÎTÊBÊN KURDÎ

Bi pirsên **Sîdar Yiğitê Serkan Birûsk** behsa nivîskarîya xwe kir û herwiha li ser kitêba wî ya ku hatibû wergerandin bo zimanê swêdî deng kir.



Dr. Chero Eliassi

Li ser kitêba xwe ya bi navê *Diasporic Welfare Landscapes (Refêha li diyasporayê)* berhemeka wê ya teza doktorayê ye ku li ser wergehên ku xerîb, bi taybetî jî pênaberên kurdan dimînin nasandinek kir.



Haci Akman, profesorê etnolojîyê ji Zanîngeha Bergenê, li ser wêjeyê wekî berxwedan û mîrateya çandî û herwiha li ser hişmendîya bêdewletî – hişmendîya kolektîfê deng kir.



Zara Uzun Kjellner kitêba xwe ya bi navê *Radio Yerevan* ku li ser jîyana pênc kurdên li diyasporayê ye da nasîn. Omar Şêxmus jî li ser radyoya Erîvanê çend têbînîyên xwe anîn ziman.





Rojnamevan û nivîskar **Kurdo Baksi** bi **Keya Izol** re li ser bîranînên wî bi pirs û bersiva kitêba *Ji Siverekê beta Stockholmê* da nasandin. Ev kitêb bi kurmancî, li welêt weşanxaneya Avestayê weşandibû. Îsal bi swêdî jî ji aliyê weşanxaneya APECê ve hat weşand.



M Alî Kut li ser navê komela nivîskarên kurd li Swêdê (YNKS) li ser romana **Mehmed Dehswar** ya nû, *Parsek* bi nivîskar re sohbetek kir û herwiha Mehmed Dehswar jî li ser nivîsari û romanên xwe deng kir.



Hashem Ahmadzadeh axaftinek li ser perspektîfên pêşerojê ji bo wêjeya kurdî de deng kir.



Panela gotûbêjê: **M. Alî K.**, **Mahmud Lewendî**, **Mehmed Dehswar**, **Serkan Birûsk**



Li ser edebiyata kurdî li dîyasporayê Mahmud Lewendî bi hejmar ji salên 1976î heta 2000an kovar, kitêp û weşanxaneyên ku li Swêdê hebûn pêşkeş kir. Li gor hejmarên wî 1450 kitêp, kovar û rojname 170, weşanxane 45 û nivîskar 255.


Keya Îzol û Hayrettin Güven gotobêjek di derbarê zarokên kurd û perwerdeya ziman û li dîyasporayê em ê çing bi pêş bixin, deng kirin.

- Rola malbat, dibistan û komeleyan çî ye?
- Em çawa dikarin zarok û ciwanan teşwîq bikin ku hem bi zimanê kurdî û hem jî bi swêdî bixwînin?



Richard Nordström bi kurtî bahsa nivîskarîya xwe kir û naveroka romana xwe ya nû, *Bland ingenjörer och spioner* ku bi swêdî û îngilîzî îsal derketîbû, da nasîn.

Beşek ji tabloyên **Roni Ciftci**





Altun Başaran di bîranîna Mem Xelîkan de deng dike.



Keça Mem Xelîkan, Hêlîn Celeblî di bîranîna bavê xwe de deng dike.



Seyfî Doğan di bîranîna Mem Xelîkan de deng dike.



Ji dengê Mem Xelîkan beşdarên bîranînê
guhdarêya helbestên wî kîrin.



Ev wêneyên ji pêiêngehê ji aliyê Keya Îzol û Ibrahîm Çifçi ve hatine wergirtin.



LI SER MEM XELÎKAN KILAMEKA ŞÎNÊ

Vere vêda vere vêda arabak Mem têda têye giran giran

bi dora rêda

Şîna Memê hat kirine pêda pêda

Ev ci mirnî ye ji nişkava di destî Rexmê da

Te ji xwe bi şiva hiştin çar keçik û xanima xwe va

Gelîkom dinan şîna Memê li gundî Xelika

Ma gelîkom bike şînê Memê bi heft zirava

Rûyê xwe rûcikandin qetandin bisk û percemên xwe va

Ev ci mirnî têye ji nişkava

Xamilandin bi axa gorê li goristana Xelika da

Felekê bi kîn e, car bi car recalê mêra ji me distîne

Mem, Mecit, Kamil, Samî

Î ki Serabê min nasnake

ê mîna încîya sipî di nav zêrî zer da

.....

Altun Başaran

Meçit

Emekdarê çapxanê APECê

Hevkarê kovarê Bîrnebûnê

APECê heta rojê îro hefsed sernav kîtêp çapkirîye.

Meçit, di her rûpelekê wan kîtêbanan da xûya henîye xwe heye.

Meçit neferekî çandê, dîrokê û nasnamê bû.

Karê wî; xezîneya bingehîya intellektuella kurdan bû.

Çapxanêya APECê alîkarîya pir nivîskaran kirîye.

Kîtêbên wanan bêdewa çap kirin anjî bi bedelekî erzan.

Di vî karî da emegî Meçit girîng bû.

Eger ew imkana nabûya dibê ku hewqas kîtêb nedihatî çapkirin.

Kovara Bîrnebûnê ronîya çavên Meçit bû.

Meçit bi Bîrnebûnê serbilind û dilşad bû.

Emegî Meçit di ber Bîrnebûnê da pir û pir bû.

Meçit gelek titîz bû, nedixwast ku di Bîrnebûnê da şaşitîyêk bibe.

Meçit insanekî dilovan, dilsoz, jîr û jêhatî bû.



Seyfi Doğan

Sewrikê Xelikan

Altun Basaran

Di sala 1956an de li Anatoliya Navîn, li gundê Xelîkan sêwrikekê li ser Anatoliya Navîn vena, şewqa xwe da ser cîyayên Xelîka (Qerecedax) Ev gir bû mezin bû, ji gundê xwe, ji xelkê xwe pir hez dikir. Xwend, bu doktor. Di nav însanî xwe de qet tu cara pozbilindî nekir, xwe di ser kesî re mezin nedît. Di nav xelkê xwe de xwe wek wan didît.

Muayanexaneya xwe li Kulluyê vekir, ji bo ku xizmetê xelkê

xwe bike. Pir nexwaş haltenik bûn, desteng bûn. Bêpere li wan mêz dikir. Dermanê wan jî pi-re cara bi xwe ji wan re distand. Nexwaşên xwe piranî ji gundan dihatin. Yên ku westê xwe tunewûn bi erebê xwe ev dibirin gundên wan. Weke doktor kesê li Qulekê ku Memê nasnake tune. Min jî ew weng naskir.

Dema kovara Bîrnebûnê derket, me her duyan jî di kovarê de dinivîsand. Carekê em



Mem Xelîkan, Ayşe Güler, Altun Başaran, Seyfi Doğan, Mecit Çifçi, Harun Coşar

çûn Qulekê, li mala Memê, em bûn mêvan. Ji ber wê salê kitêba min derketibû, Mexmê ez dawetî mala xwe kirim. Xanima Mexmê, Rehmê xwarineka xweş çêkiribû. Min li mala wan jî dît ku Mexmê çiqas însanekî bi hurmet û xwedî edetên me yên kurdî bû. Em dan jor xwe û xizmetê me kir. Dura ji bo şeva kurdên Anatolîya Navîn ku kovara Bîrnebûnê û Waqifa Kurdên Anatoliya Navîn li Stockholmê bi hev re çêkiribûn hat Stockholmê. Bi hatina xwe ya Stockholmê li nav hevkar û pişgîrên kovarê şewqek vebû, çend

rojên bi sohbet, civîn û aktivîteyên çandî dagirtî derbas bûn.

Li Stockholmê em rojekê li mala Elî Çiftçi civîn; Mem Xelikan, Seyfî Doğan, Mecit Çifçi, Harun Coşar, Ayşe Güler û ez. Sohbeteka bi yaranîyên herêmî û xweş bû.

21.07.2025an de bi xemgîniyeka mezin min bihst ku Mem li mala xwe ya Ankareyê dema ku bi torîne xwe ve dilîst, dilê xwe sikinîye cûye ser rehma Xwadê.

Axa Xelikan Mem berve xwe kişand û bi axa xwe xemiland. Şewqa vê sêwrikê hişt li şûna xwe.



Li mala Mem Xelikan

Mem Xelîkan

Mem Xelîkan girîngîya çand û gelzanîyê pir baş dizanî.

Wî dizanî ku çand û gelzanî bingehîyên nasnamê ne.

Loma, Memê bi sadan kîlamên dila û şîna, çêrok, henek û cilûbergên kevnar berhevkin. Ev ji bîrkinênê xelas kirin û ji generasyonên pêşaroj re mîrasaka zengîn amada kir.

Mem Xelîkan doktorekî humanîst û îdéalîst bû.

Memî Sosê wek pirênsîbê Hîpokrat doktorîya xwe dikir.

Derdê wî ne pere û pûl bû.

Armanca Memê tendûrîstîya gel bû.

Mem Xelîkan helbesvanê kurdan, Anatolîya Navîn, reşîya û xelîka ye.

Rêzên Memê hewarên kezebşewitîyê ne, hêvîyê û hesretê ne.

Helbestên Mem Xelîkan qirînyên gelê kurd in.

Du kîtêbê Mem Xelîkan ên şîra ji alîyê weşanxaneyê APECê ve hatin weşandin.

Şevbidar im û Serenad.

memê

agirê ku te dada

rê fireh û ronî kir û dike

mehmî sosê

agirê ku te dada

hafiza gel

dewlement kir û dike

mem xelîkan

agirê ku te dada

bêhna me fireh kir û dike

mehmet şîrîn dağ

agirê ku te dada

perda reş şewitand

memî eşê êrevo

rêzên te ye

wek çêmên bêhiştê

dihêrikine

memî naîmî malê alî çorloyo

cesarete te ye ronakbîr

rê vekir

Seyfi Doğan

me çavên xwe
li xelika vekirin
me li xelikan
ji agir û rojê hazkir
em li xelika
êvîndar û hêvîdar bûn
em rêvîyê rîyekê bûn
hesrete me
axa bavana bû
xewn û xeyalên me
bîranînên me
yên li dijî dizî şevan yekbûn

Seyfi Doğan



Mem Xelîkanê Derya-Dil

(1956-2025)

Rohat Alakom

Doxtorê kurd Memed Ozsoy di sala 1956an de li gundê Xelîkan (Qerejdaxa Kulu/Konyayê) hatiye dinê. Wî di sala 1997an de dest pê kiriye berhem û xebatên xwe di kovara Bîrnebûnê de weşandiye. Wî heta niha di nivîs û helbestên xwe de navên wek Mem, Mem û Hem, M. Şîrîn Dax, Mem Xelîkan bi kar aniyê. Ji aliyê gundiyên xwe de bi navê Memê Sosê jî hatiye nasîn. Min bawer dikir ku ev leqeb navê dayîk yan jî pîrka wî ye, lê wisa derneket, belkî jî navê binemala wî ye. Piştî xwendina xwe ya zanîngehê bi salan li Kuliyê (kurdên deverê jê re dibêjin Qulek) qezaya bajarê Konyayê kar kiriye. Paşê hatiye paytextê Tirkîyê Enqereyê, karê xwe yê doxtorîyê li wir domandiye û li wir jî wefat kiriye (22-7-2025). Ew di nav kurdên herêmê û gelek hatiye hezkirin û naskirin. Mem Xelîkan kesekî dil-

fireh/ferah, nevspîçûk û sade bû, ji hemû rûyê wî şadiyek dibarî û her dima. Belê ew kesekî beşerxweş, derya-dil bû.

Kêfa Mem Xelîkan gelek ji çanda kurdên Anatoliya Navîn re dihat, ew bibû evîndarê vê çanda ber windabûn û jibîrbûnê ye, ev evîna wî wek evîna Mem û Zîn ya nemirî bû. Navê Mem Xelîkan bêgûman navê destana kurdan ya netewî Mem û Zînê tîne bîra me. Mem Xelîkan dema navê Mem jî xwe re hîlbijartiye belkî jî Memê lehengê destana Ehmedê Xanî daye ber çavan. Bi koçkirina Mem Xelîkan em dikarin bêjin ku êdî Zîn bê Mem ma!

Mijara ku Mem Xelîkan zêdetir ji hez kiriye bêgûman dewlemendî û rengînîya folklorê kurd e. Wî di nav xebatên xwe yê folklorîk de cîhekî fireh daye berhevkirina kilam û stranên kurdî. Ji van kilaman gelek wî di

kovara Bîrnebûnê de beş beş weşandine, heta niha 17 beş amade kirine: “Kilamên me” (XVII). Wî bi hunermendên kurd yê mûzîsyen, stranbêj û dengbêj re hevpeyvîn çêkirine, berhemên wan dane nasandin û têkiliyên folklorê û mûzîkê giring dîtiye. Min ev nivîsa wî bi hewaseke mezin xwendibû: “*Ji Remziyê kurd heta rojên îroyîn mûzîka kurd ya Anatoliya Navîn*” (Bîrnebûn, hejmar 12/2001). Di destpêka salên 2000an de çawa tê zanîn bûbû mode gelek hunermendên herêmê berhemên xwe bi kasêt derdixistin û difrotin. Wan, pîyasaya mûzîkê gelek dewlemend û rengîn kiribûn. Ev nivîsên wî yê ku di kovara Bîrnebûnê de derketine siberojê dikarin bên berhev kirin û bi forma pirtûkekê bên weşandin. Kovara Bîrnebûn (Kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên Anatoliyê) çarçûk sedsal e li Swêdê derdikeve (hejmar 1/1997), heta niha di nav van 28 salan de qasî 93 hejmarên wê hatine weşandin. Pêşî kurdî û tirkî derket, paşê zimanê xwe bi tenê kir kurdî. Mirov dikare bêje ku temen û dîroka karên nivîsên Mem Xelîkan qasî temenê Bîrnebûnê

ye. Di pratîkê de mirov dikare bêje ku wî wek nûçegîhanê vê kovarê kar kiriye, di her hejmareke kovarê de em rastî nivîsa ya jî helbestekî wî tî. Carina wî wêneyên nadîr û dûrîdest, dokûment û çavkanîyên din jî bi dest xistine û peyderpey ji kovarê re şandine, wek mînak wêneyekî ecêb xweş yê bilûrvankî kurd Hesê Çûcê ku wî peyda kiribû bergê hejmareke Bîrnebûnê xemilandiye (hejmar 11/2000).



Dema avakirina komeleya KOMKURD-ANê Mem Xelîkan axaftinekê dike (2015)

Mem Xelîkan bi helbestvaniya xwe jî hatibû nasîn. Helbestên wî di kovara Bîrnebûnê de hatine weşandin. Paşê wek pirtûk derketine: *Şevbider im* (Apec, 2009) û *Serenad* (Apec, 2023). Di helbestên wî de mijar û motîvên wek evîn, koçerî

û hesret gelek caran derdikevin
pêşberî me. Ew herwiha bûye
heyranekî xwezayê, wek mînak
hin helbestên wî stêrkan û
cazîbeya wan tinin ber çavan:

Şevbider im


*Stêrkan xwe veşart di ezman de
Berfîn dernakevin man bin berfê de
Şev tarî û bédengîya çûçikan
Şevbider im Axx...
Dîsa rêvî û koçber im...
(Ji Şevbider im, 2009)*

Helbestvan di berhemeke
xwe ya din de dilketî û hezkiri-
ya xwe dişîbine stêrkekê, gazî wê
dike û naxwaze ew ji wî bi dûr
bikeve û here dîyarên din:

Neçe

*Tu stêrka esîmana
Tu rengê bihara
Neçe
Bihara bêreng neke...*

Di helbesta bi navê “Be-
se were” de jî ew wiha dibêje:
“...Bese were van axanalstêrk
govendê bigerînin li asîmana...”
(Ji Serenadê, 2023). Hezkiriyên
Xelîkan di van berhemên de wek
stêrkan xemlên xwe girê didin,
hertim diçûrisin, bi şemala xwe
şewq vedidin. Ev stêrkên zêrîn
dinya me ya ku hêzên nepak di
nav tariyê de hîştine ji dûrve be jî
ronî dikin. Belê wek em dibînin



Herdu berevokên helbestan yên Mem Xelîkan

ku ev stêrkên Xelîkan vediguhirin û dibin hêzeke mezin ya hêviyê bo mirovên ku hewl didin bo li ser pêya bimînin!

Mem Xelîkan ji bo van kurdên ku ji welatê xwe dûr ketine dibe kesekî rêzdar û rûspî. Ew di sala 2015an de pêşengî û alîkariya avakirina “Komela Çandî û Piştewaniya Kurdên Anatoliya Navîn” (KOMKURD-AN) dike. Ev komela piştî salekê ji aliyê hêzên dewletê de hatiyê girtin. Di sala 2025an de em wî di çalakiyên vekirina KON-Komeleya Ziman, Çand û Hûnerê de dibînin. Ev cara pêşîn bû komeleke bi vî awayî li bajarokê Quliyê hatiyê vekirin.

Mem Xelîkan jî tevî vê şahiyê dibe û li wir axaftinekê dike. Ew li wir balê dikêşîne ser giringiya parastina ziman û çanda kurdên Anatoliya Navîn. Di van salên dawî de piştî ku ji Quliyê koç kir hate Enqerê, li vir têkiliyên wî bi kurdên hemû Anatoliya Navîn re gur û tîr dibin. Ne tenê bi nivîs û weşan, bi hatin û çûyîn tevî gelek çalakî, civîn û xebatên çandî dibe. Ew êdî wek rûspî û serekê rûmetê yê kurdên vê herêmê tê hesibîn. Dema siberojê dîroka kurdên Enqereyê bê nivîsîn bêgûman navê wî wek rêvebir û organizator jî dê bê bîr anîn.

Ez çend caran li welêt û li Swêdê rastî Mem Xelîkan hatim.



Ligel Mem Xelîkan (li rastê, 2003)

Di sala 2003an de dema ez carekê çûme Enqereyê, ez bi seredan çûm û bûm mêvanê wî. Cîhê karê wî li navenda Quliyê bû û mala wî jî li gundê Qerejdaxê li hêla Qonyayê bû. Piştî Quliyê em tevayî çûne gundê wî, camêr bi ezet û hurmet pêşwaziya me kir. Piştî xwarinê em hinekî jî li nav gund geriyan. Qerejdax gundekî mezin û şên bû. Rojtira din ez, Mem Xelîkan û hin nasên wî bi tevayî çûn dîtina çend gund û cîhên din yê vê herêmê. Ez du hevalên nivîskar û helbestvan ku ji heman gundî Qerejdaxê ne jî nas dikim, Yek ji van Nûh Ateş e ku bi lêkolînên xwe hatiye nasîn û niha li Almanyayê dimîne, helbestvan Seyfî Dogan jî niha li paytextê Swêdê, Stockholmê dijî. Dema ez di navbera salên 1980-1982an de li Almanyayê li bajarê Frankfurtê dimam min gelek caran Nûh didît, lê belê bi navekî din dihate nasîn, me jê re digot “Xaço”. Wê demê qet nehate bîra min ez jê bipirsim gelo kê ev nav dabû wî.

Beşek helbestên Mem Xelîkan bûne tekstên kilam û stranên kurdî jî. Yek ji wan hemwelatîyê

wî Ergîn Xelîkan e ku piştî koça mamosteyê xwe wiha gotiye: “*Te em şandin çolê bê av Memed Abê...*”

Di heman cîhî de ew dîyar dike ku Mem Xelîkan çawa alîkariya wî kiriye: “*...Te gelek alêkarî da min Mem Xelîkan. Helbest û berevokên te di her albûmê de bingeha reper-tuwara albûma min pêk anîn. Tu deryayek bûyî, min li ser her mijarê şîretê te digirt. Te em şandin çolê bê av Memed Abê...*”¹ Ergîn Xelîkan

ev rêzên kilama *Xerîbî* qey tu dibêjî ji bo mamosteyê xwe Mem Xelîkan gotiye: “*...bîra te kir, te nabînim*”.² Di amadekirina kila-ma *Şivan* de wî alîkariyek mezin ji Mem Xelîkan wergirtiye. Hurnermend Ergîn Xelîkan ku niha li Danîmarkayê dimîne, dibêje ku dema Mem Xelîkan xwestiye helbestekî li ser şivantiyê binivîse du şevan li çolê maye bo ka bizanibe jîyana şivanan çawa derbas dibe. Ev kilama serpêhatîyeke xwe jî heye. Dilê keçika axayê gund dikeve şivîn, lê bav nadê, şivan tê kuştin: “*De here lo lo, lo şivano...*”.³

"SER MOR Û KILAMÊN ŞÎNÊ⁽¹⁾"

Kevneşopiyeke hevpar a şîne

Malmime

Wekî piraniya çandên li çaraliyê cîhanê, çanda kurdî jî tijî kevneşopiyên dewlemend û şeweyên hestiyarî yên kûr e. Pêkanînên çandî hem hilgir û hem jî ji nû ve çêkerên bîra kolektîf in. Rîtuêlên şîne jî yek ji wan bîranîna ne ku ev bîr bi tundî tê jiyîn.

Ev rêûesm pîren bihêz in ku rabirtîyê û niha bi hev ve girê-

didin. Rîtuêl ne dubarekirina tevgerên statîk û taybetî ne; ew di heman demê de yek ji dînamîkên girîng di nav çandekê de ne ku hişmendîya kolektîf tê de zindî tê girtin, nasname têne nasîn û girêdanên nîşan têne damezrandin.

Ev pratîk, ku hişmendîya takekesî û kolektîf xwedî dikin, bûyerên berê tînin nav dema



⁽¹⁾ Ev nivîs ji tirkî Alî Çiftçi wegerandiye kurmancî.

niha di heman demê de derfeta ji nû ve şîrovekirin û wateyê bi rêya tevliheviyek hemdem ve pêşkêş dikin.

Rîtuêlên şîn û bîranînê, di eslê xwe de, ji êş û windakirina kesane derdikeve, û ji kesayetiyê vediguhere karakterek kolektîf.

Gotin, kilam, melodî, sembola û tevgerên ku di demên vê rîtuêlê de dubare dibin, bandorên kûr li ser merîya dihêlin. Ev dubarekirin ezmûnên kesane yê kesekî bi bîra kolektîf ve girêdidin; ew ne ji bo jibîrkirina tiştê ku qewimîye, lê ji bo veguherandina wê bi rêya bîranînê xizmetê dikin. Di heman demê de, rêûresm bi hilgirtina ezmûnên nîfşên berê bo dema niha, berdewamiya çandî misoger dikin. Ji ber vê yekê, rêûresm ne tenê kevneşopî ne; ew cihên girîng û zindî yê bîranînê ne ku bîranînê zindî dihêlin, beşdarî avakirina nasnameyê dibin û pêşkeftina civakî, hestiyarî û psîkolojîk a kesekî xurt dikin.

Rîtuêlek ku ez di zarokatiya xwe de gelek caran pê re rû bi rû bibûm, piştî çend salan, di sohbetekê de li erdnîgariyeke bi tamamî cuda, min bi rabirdûya xwe ve girêda. Dema ku ez û

hevalê min ê delal Dr. Mecîd Salih di hezîrana 2025an de li Hewlêrê civiyan, me bi awayekî xwezayî, bêyî plansazî an amadekariyek pêşwext, li ser "ser mor" û "kilamên şînê" dest bi axaftinê kir. Mijar bi awayekî xurt hem bi bîranînên min ên kesane û hem jî bi berjewendiyên min ên çandî ve girêdayî bû, ku ev yek îlhama nivîsandina vê nivîsê da min. Demên weha yê xweber (spontane) careke din girîngiya təkiliya çandî û têgihîştina hevbeş nîşan didin.

Bêyî ku pir zêde bikevim nav hûrgiliyan, wekî xalek destpêkê, di vê nivîsê de ez ê hewl bidim ku li ser kevneşopiyekê binivîsim ku ez balkêş dibînim: "ser mor û kilamên şîna," ku mirîyan bi bîr tîne. Armanca min li vir ew e ku girîngiya naskirina dewlemendîya çandî ya me (xwe naskirin) tekez bikim û hişmendî û berpirsiyariya parastina van nirxan û veguhestina wan ji nîfşên pêşerojê re pêş bixim.

Ew rêûresmek e ku piştî mirinê tê kirin beşek girîng a şîneye. Ew rêûresmek e ku du navên wê yê cuda hene, lê dişibin hev. *Ser mor* û *kilamên şîna*. Ev

rastî, şêweyek ji îfadeya civakî û hestiyarî ya ji heman kevneşopiyê hatî wergirtin vediguhere dewlemendiyek çandî.

“Ser mor” rîtualeke kevneşopî ya kurdî ye ku nûnertiya adeteke kûr dike ku li seranserê erdnîgarîyeke fireh tê kirin, ji herêma Zehaw a Rojhilatê Kurdistanê dest pê dike û heta herêmên Germîyan û Xaneqîn ên Başûrê Kurdistanê dirêj dibe. Ev herêm xwedî mîrateyeke çandî ya pir dewlemend û kevnar e ku komên etnîkî, dînî (olî) û mezhebî yên cihêreng bi sedsalan bi hev re jîyane. Civakên girêdayî mezhebên yarsan, kakayî û şafî sîstem û rêûresmên xwe yên baweriyê yên kûr û dewlemend bi awayên taybetî yên herêmê diparêzin. Her wargeh kevneşopîya xwe ya şînê bi şert û mercên xwe yên bêhempa diparêze û berdewamiya vê dewlemendiya çandî ya pir rengî misoger dike.

“Kîlamên şîna” jî rêûresmeke xatirxwestinê ya hevpar e di nav kurdên ku bi sedsalan li bajarên Anatoliyê yên wekî Konya, Ankara û Kırşehirê dijîn. Li şûna pirrengîya dînî ya cihêreng di nav kurdên Anatoliyê de, îslam

û mezheba henîfî, dîn û mezheba fermî ya dewleta Tirkîyeyê, pergala serdest in. Kurdên ji bawerî û mezhebên cuda, wekî şafî, elewî, yarsanî û yên din, ku di nav sedsalan de ji ber sedemên cûda sirgûnî Anatoliyê bûne an jî koçber bûne, ji ber têgihîştina yekreng a dewleta Tirkîyeyê (yek netewe, yek ala, yek welat, yek dewlet) li Anatoliyê rastî guhartina dînî hatine.

Her du rîtual, tevî dûrbûna erdnîgarî û cudahiyên dînî, hişmendîya çandî ya hevpar a ku ji hêla nasnameya etnîkî ve hatî afirandin diparêzin û didomînin, di heman demê de nîşan didin ka mîrata çandî çawa dikare were dewlemend kirin. Ev nîşan dide ku mîrata çandî ne tenê ji hêla sîstemên baweriyê ve, lê di heman demê de ji hêla nasnameya etnîkî ve jî tèn bi rêvebirin.

Wekhevîya herî taybetmend ku di herdu rêûresmên *ser mor* û *kîlamên şîna* de derdikeve pêş, rola çalak a jinan di pêvajoya şînê de ye. Di van rêûresman de, jin wek adet rûyên xwe dirûçkînin, xwîn dibin ax û xwelî li ser xwe dikin û bi awayekî hevbeş şînê digirin.

Mêrên ku beşdarî rêûresmê dibin rûyên xwe naçûrîkinin, lê hatiye dîtin ku li çokên xwe dixin û xwelî li ser xwe dîkin. Di dema şînê de, birîndarbûna rû rêyek e ji bo derbirîna hestên kûr ên şînê. Jina ku kilama şînê di-

bêje bi gelemperî li navendê ye, dorpêçkirî bi jinên ku bi fizîkî piştgiriyê didin wê, hem xemgîniya wê parve dîkin û hem jî nahêlin ku ew zera bide xwe. Jinên din ên ku li hember ya ku kilama şînê distrê rûniştî ne, bi



koroyek hêstiran tevî şîne dibin, di navberên şîne de dengê kolektîf, bihêz û dengbêjî distirên. Hêza bandora dilşewat a rêûresmê ne tenê ji melodîkbûna şîne ye, di heman demê de sembolîk û hestyariyê jî tê.

Li hin herêman, şîngirên(şare) jin ên navdar bi taybetî ji bo merasîmên cenazeyê tene vexwendin. Ev şîn hem nîşana rêzgirtinê ji bo miriyan e û hem jî xurtkirina rituelî ya bîra kolektîf e. Mînakek, yek ji xizmên min, Fatê Hamdaşeya rehmetî (ji gundê Beşkardeş-Kulu), şîngirek navdar a herêma me bû. Fatê Hamdaşeya pir caran beşdarî merasîmên cenazeyê li gundê Omara dibû, û carinan bi taybetî dihat anîn. Mînakên weha nîşan didin ku şîn ne tenê îfadeyek şîne ye, lê di heman demê de fonksiyonek e ku bîra kolektîf zindî dihêle û tîkiliyên çandî xurt dike. Şîngir herciqas xwedî nasandîneka hindik a li ser mirî be jî, jêhatîbûnek di îfadekirina xemgîniya kûr de bi rêya hîsên xwe yê hundurî nîşan dide.

Her çend pêvajoya şîne li herêma Zehaw dikare hefteyan, mehan, an jî salan bidome jî, di nav kurdên Anatoliyê de, ev

dem bi gelemperî bi sê rojan ve sînordar e. Ev cûdahî ne tenê demkî ye; her wiha ji hêla diwarîya rêûresmê û fonksiyona wê ya civakî-çandî ve balkêş e.

Mîrateya çandî û bandorên psîkososyal

Rêtûelên weha piştrast dikin ku xemgîniya takekesî ne tenê ezmûnek navxweyî ye, lê bi parvekirina wê bi civakê re dibe pêvajoyek kolektîf. Ev performans şîn û zimanê laş a ku di dema pêvajoya xemgîniyê de tê kirin, hem îfadeya êşa takekesî û hem jî hevgerîna malbatî û civakî hêsan dike. Piştgiriya civakî takekesan hêzdar dike ku hîs bikin ku ew ne bi tenê ne.

Ji perspektîfeke psîkolojîk ve, îfadekirina êşa xwe, eşkerêkirin û parvekirina hestên xwe, rihe-tiyê peyda dike û dibe alîkar ku pêvajoya xemgîniyê bi awayekî saxlem berdewam bike û biqedê.

Şîn ne tenê kevneşopîyeke devkî ye, lê di heman demê de derbirîna ruhî (giyanî) ye jî.

Bi kurtî:

Ruh di navenda van merasîman de ye. Mirov êş û xemgîniyê bi



kûrahî hîs dikin û li rêyan digerin ku wan îfade bikin. Şîn li vir amûrek (aletek) e; ew ne tenê dengê, tevgerek an melodyek e; ew bi rastî çalakiyek e ku ruh qenc dike. Qîrîna ruh di dema pêvajoya xemgîniyê de cîhana hundurîn û aloziya hestiyarî ya kesek eşkere dike, wan teşwîq dike ku wê bi kesên li dora xwe re parve bikin.

Rêûresmên şîne yên ser mor û kilamên şîna, kevneşopiyekê kurdî ku bi deng, melodî û tevgerê tê îfadekirin, pêvajoya sivikkirina êşa hundurîn û adap-

tekirina windabûnê (ya mirî) di kesên li dû xwe mayî de bi lez dike, bi gotineke din, pêvajoya rihetkirina ruhî (giyanî) ye.

Di encamê de, rêûresmên ser mor û kilamên şîna di bîra çandî ya gelê kurd de bi kûrahî kok digirin, sembola hevgirtina civakî û çandî ne, û kevneşopiyekê girîng a şîne ne. Tevî cudahiyên erdnîgarî, mezhebî û dînî (olî), hevgirtina van rêûresman li ser bingehek çandî ya hevpar ji bo berdewamiya nasnameya kurdî girîng e. Adet û kevneşopî mîrata dewlemend a rabirdûyê

hildigirin pêşerojê, takekesan û civakan tînin cem hev û entegrasyona civakî pêş dixin.

Mîrata çandî ne tenê bîranîna rabirdûyê ye. Ew di heman demê de pêvajoyeka dînamîk a zindî ye ku nasnameyên takekesan û civakan bi hêz dike. Rola giyan di vê pêvajoyê de girîngiya nasnameyek çandî ya hevpar û awayên ku mirov hestên xwe yên hundurîn diyar dikin eşkere dike. Pêvajoya şînê di hawîrdorek hevgerîna civakî de hem ji bo başbûna takekesê û hem jî ji

bo tevahîya civakê dibe alîkar û parastina mîrata çandî di nav nifşan de pêş dixê.

Rîtuêlên adetî yê wêkî sermor û kilamen şîna çavkaniyên dewlemend in ku bîra kolektîf, mîrata çandî û tîkiliyên etnîkî yê gelê kurd xurt dikin. Di vê çarçoveyê de, mînakên rîtuêlên weha, ku di heman demê de cihêrengiya çandî û hevgerîna etnîkî diparêzin, hêjayî lêkolînên antropolojîk û psîkososyal ên berfirehtir in.

Têbînî:

Dr. Mecîd Saleh zanyar û nivîskarekî siyasî ye. Çend berhemên wî yê girîng ev in:

- *Ramanên neteweyî di wêjeya Şêx Nûrî Şêx Salih de*
- *Selahedînê Eyubî*
- *Mistefa Paşa Yamûlkî - Portreya şervaneki Kurd*
- *Refîq Hilmî şoreşgerê neteweyî*

Malmime

Rêveberê Çand û Hunerê, Terapîstê Hunerê, perwerdekarê uunerî û muzeyê

CEO ya Kolektîfa Hunerê ya Navneteweyî (IAC)

Köln, 19.07.2025

Derbarê dîroka kevnar a nexş û xemlên berik û berîyên kurdan de

Zaze Mahabadî

Bîra kevnar: Xemlên ku ji kevir da heta tevnê tîn. Li ser sêramikên kevnar yên ku di nav zagrosan de hatine dîtîn û ji sedsalên 2000-1000 berî zayîne têne dîyar kirin, hîn jî nexş û xemlên wan di beren û goran a kurdan de jî dijîn.



Ev qedeh û çömlêkên kevnar di lêkolînên arkeolojîk yên li çîyayên Zagros de hatine dîtîn; figûran ku li ser wan hatine xêzkirin,

sêmbolên qedîm ên wî erdî ne - sêmbolên ku bi gelek şêvazan heta îro berdewamin. Ji zarokîyê min, her gav min dixwest ku bizanim ev xeml û nexşên di goran û kîlîmên kurdan de ji ku derê têne.

Di destpêkê de difikirîyam ku ew tenê ji tabîate hatine vergirtin, an jî ji hevaltîya ax û ezmanê re têne şopandin.

Belkî ew dîyarîya tabîatê bû. Lê min ne dizanî ku ew xwedî rîşên kevnar ên bi hezarên salan berî me ye.

Dema ku bûm arkelog, min fam kir ku ev nexş tenê ne “süs” in. Her yekê wan t êkîlîyeke xwe bi bawerî, bi çîrok, bi hêstekî ruhî û bi t êgihiştinekî cîhanî heye.

Ev xemlên ku li kîlîman, goran û eşyayên rojane yên gelê kurd hatine rêsandin, rastî ye ji bîra kevnar a Zagros û mîrasîyên çandîyên wî erdî ne.

Ceran û Motîf: Vateya vênayên Kevnar tenê amûrên xebatê ne;

Ceran li ser wan figûr û nexşên ku hatine çêkirin, nasnameya erd û çanda gelî têne xwandin.



Li gor şêvazê, wan motîfan dikare du beşên sereke bin:


Nexşen geometrîyê: Girê, sêgûş, polîgon û şêvazên ku bi endaz û nîzam tane çêkirin.

Ev motîfanan dîroka endazyarî û arayîşa nîzama mirovên kevnar nîşan didin.

Nexşen sêmbolîk: Şêvazên ku têne bikar anîn ji bo îfade kirina hest, bawerî, xwedan, an jî hazên doğaya.

Yêk ji van şêvazên yên herî zanîn çarka felekê (svastika) ye, ku di gelek çandan kevnar de vekî nîşanê tora jîyan û eylem tê dîtin.

Motîfa çarka felekê ne sêmbolê dinê an neteveyekê ye; belkî nîşanê tora cîhanê, qanûna kaderê û prensîpê “kirin û girêdanê” (karma) ye. Yani, têgotina kevnar a “Çi bixwî, ev biçim” bi nexş hatte nivîsandin.



Motîfan, bexteke xweş li ser keviran tanê bîryar kirin, an jî bi hev re tane girêdan û kompozîsyonê çêdikin.

Ev kompozîsyon, asta êstetik û astengîya rêz û têgihiştinê ya cîvakê diyar dike.

Ji kevirên zagros heta tevnên kurdî

Di nav zagros û di sêramîkên ku ji vê derê hatine dîtin de, bi taybetî

di berhevoka kîlîmên a kurdî de, motîfan ev in:

- Figürên mîtolojîk: Harpî (yarî mirov, yarî heyvan), Sîmurg/ Zümrüdê Anqa, ejder,
- Motîfên heyvvanî: Qartal, kulîlk, şêr, gur, ga, hesp, gêyik, biçûk, qutar, masî,
- Nexşen nebatanî: Gul, pel, seberk (sê pelî), pençberk (pênc pelî), sadberk (pelên xwe girêdayî),
- Dara jîyanê: Nişanê zayîn, berdewamî û pîrozbûna jîyanê.

Ev motîfan tenê êstetik ne, belkî bawerî û pîrozîyê jî têne gotin:

- Motîfa Tavê (roj): Sêmbolê Xwedê rojê û bereketê,
 - Motîfa Stêrkê: Sêmbolê tanriçêya îştâr û haza zayînê,
 - Motîfa Hîvê: îfade ya tanrîya sîn û aramîya hundirî.
- Sêmbol, jin û tevn: Çanda ku dijî

Her çend bawerî û tanrî di demsalên dûr de guhertin,

Lê ev sêmbolên kevnar di destan jinan de hîn jî zindî ne.

Di kîlîmên ku jinên kurd bi tevnin, di goran ku bi reng û şêvaz rêsandine, dengê zagros, dengê kevnar û dengê bîr û bawerî hîn jî tê guhertin.

Dema ku tu ser kîlîmekî kurdî tane nêrîn, ev tenê meta ne -


belkî belgeyakî arkeolojîk, şehîdê bîr û zimanê çanda kevnar e.

Her nexş, peyamekî ye ji dîrok ve, vekî şopandina domdarîya nasnameya kurdî û dîroka vê çanda. Ji Girê Mirazan heta berik û ferşên kurdî yên kurdî

Bîra şêvaz û nişan

Li ser stêlên kevirên li Girê Mirazan (Göbekli tepe), nişanên torên şebekeyê bi şêvazê elmasan (bak-





lava) têne dîtin - ev nexşan dîyar dîkin ku rêzîknameya pîroz û tora kozmîk ji vê demê ve hatîye afirandin.

Li gor arkeolog Klaus Schmidt: Xet û rêzîkên li ser van kevîran, ne xemlên mîmarî ne; ev pênasîya rêzîk û nizamên pîroz in.”

(Sie bauten die ersten Tempel, 2006)

Ji vê têgihiştinê ve, dibe ku nexş û xemlên kevnan li ser keviran, bi rêşên jinan di berik û ferşên Kurdî de, bi hev re girêdayî ne - tora cîhanê, sêmbolê hevsengiya ax û ezman.

Berxwedana Çandî:

Colemêrgê û herêmên çîyayî herêmên li colemêrgê, hêrkî, geve, şemzînan, jêrkî û Bervarî berdevamîyê nîşan didin ku hunera jinan bi nexşên elmasî, dara jîyanê, torên şebekeyî û stêrkî têne rêsandin.

Her tevn, duayek e - her rêş, bîrek e.

Çavkanî

Klaus Schmidt, *Sie bauten die ersten Tempel: Das rätselhaftige Heiligtum der Steinzeitjäger*, C.H. Beck Verlag, München, 2006.

Mehmet Özdoğan, *Neolitik Devrim û Çandan Rojhilata Nêzik*, VVeşanên Zanîngeha Stenbolê, 2010.

Şemsa Tuğrul, *Kilamên Kurdan û Zimanê Desenê*, Stenbol: VVeşanên Arkeolojî û Hüner, 1999.

Oya Topçuoğlu, "Weaving the Sacred: Symbolism in Anatolian Textiles", *Journal of Near Eastern Studies*, 2017.

Aram Tigran Institute (ed.), *Nîşan û Nasname di Kilamên Hakkarî de*,

Berik û ferş ne tenê huner in, lê belgeyên çandî û mîtolojîk in ku di nav cîvakê de di serdemaya neolîtîkê ve xistin bingeha êstetîk û bawerî.

Çavkanî

Ji kevirên elmasên Girê Mirazan heta tevnên berikên Kurdî yê colemêrgê, heman rêz, heman tor, heman sêmbol têne dîtin.

Gerdûna ku li ser kevir hate xêzkirin, bi destên jinan dîsa di tevnê de tê jîyan kirin.

Ev berdevamî, pêyamek e ji dîrok ve - dengê jin, dengê çanda Zagros û dengê mirovahîyê ku hîn jî tê gotin.

Kulîlka çilmisî

Arvin Abdollahzadeh

Carekê mêşeke hingiv hebû bi navê Bên. Bên li nav şaneyeke mezin ya hingiv de bi gelek mêşên din re dijîya. Ew xebatkarekî bi dil û can bû ku her roj li wê derûdorê, hinda serê gul û gulîlka difirîya şîreya wan dimêjî û toza wan berhev dikir. Her çend wî ji karê xwe bi giştî hez dikir, lê dîsa jî gulek li wir hebû ku dilê wî zedetir girtibû.

Guleke gir û rengareng bû. Bi bêhna xwe ya xweş bala wî dikişand û hest bi keyfxaweşî û rezamendîyê dikir.

Ew her roj ber bi wê gulê ve difirîya û hindî dikarî toz berhev dikir. Êdî dest pê kiribû, jê re digot; gula min ya bi tenê. Dema nêzî gulê dibû ewqas hest bi şanazî û bextewerî dikir ku dikarî bi sieta li wê derê bimîne bi firîna hinda

serê wê ji ciwanî û bedewîya wê çêj wergire.

Cihê ku ew lê dijîya li deverekî gelek xweş û sipehî bû. Serê sibê ta êvarê bi tava rojê germ dibû. Li wir xwezayeke pir bedew hebû, bi gelek gul û kulîlkên rengareng bi gîya û gulzarê xweşik xemilî bû. Her tişt di nav aştî û aramîyêke bêsînor de jîyana xwe birêve dibir.

Bên bi jîyana wê deverê pir kêfxweş bû û her kêlî bi kêlî ku li cem gula xwe ya bi tenê derbas dikir, ew zêdetir û zêdetir dilşad dibû. Lê belê rojekê dema Bên ber bi wê gule ve difirîya, hest bi diltengîyêkê kir.

Dît ku li rûyê wê de xemgînîyek xuya dike. Gul çilmisî bû û ber bi zuhabûnê ve diçu.

Bên gelek xemgîn bû. Kete fikra wan hemû dem

û kêlîyên xweş ku heta niha bi wê gulê re derbaskiribû. Ew belkî nekare careke din wê bibîne. Bê ewqas ber xwe ket ku êdî nedizanî yê çawa bike. Wereng hest dikir ku belkî baştirîn hevalê xwe yê jîyanê ji dest dide û nedizanî yê çawan carekedinjîyanaxwebirêvebibe. Dema bi xemgînî ji wê derdorê difirîya, guleke din dît ku her çend bîna Gula bitenê gir û rengîn nebû, lê dîsa ji mîna wê xweşik û bedew bû. Bê firda û çu cem wê. Bê dît ku ew ji bîna ya din sipehî ye û dilê mirov şad dike. Kêfxweş bû û sipasiya gulê kir ji bo ku wî ji xwe ra hevaleke nû di wê de dîtibû. Ji wê rojê şûn de, Bê her roj difirîya diçu cem wê gula taze, toz berhev dikir û jê şîre dimijit.

Bê fê m kir ku, tevî ku dema tiştê heyî diguherin, dibin sedemê dilgiranîyê mirov, lê dîsa ji derfetê dîtir çê dibin ji bo ku tiştê nû yê baş û sipehî derkevin hole. Wî fê m kir, her dem yê derfetê nu çêbibin ku mirov xwe re gulê teze peyda bike û jê hez bike û pê şadbibe. Ji wê rojê şûn de, Bê waneyeke girîng fêrbû, ku jîyan teji ye

bi nujenbûn û veguhartinan, hinek cara erênî û hinek cara jî nerênî. Hema çî dibe bila bibê, divê her dem Bê ji bo derfet û pêşhatên nu berhev be og wan bi hembêza germ pêşwazî bike. Tevî ku wî bîra tiştên xwe yê berê dikir, lê hêvî û bendewariya xwe ji bo tiştên bê jî qut nedikir.

Bê piştî wê serpehatîya hanê êdî bi awayeke din li jîyanê dinêrî. Ji her tiştê di jîyana wî de dihatin pêş, çî biçûk çî mezin, rêz digirt û qîmeta wan dizanî, bîna dema avabûna rojê yan jî bayê hênîkê havînê. Wî li wê rojê şûn de, bêhtir qedir û qîmet dida hevalên xwe û dema xwe zêdetir bi hevalê xwe yê di nav şanê de derbas dikir. Wî hest pê kiribû ku di jîyanê de pir tişt hene ku mirov keyfxweş dike û pewîst e ku jê re resipasdar/şikurdar be. Bê têgihîştibû kû ti car di jîyanê de ti tişt ji ber xwe çênabin. Ji bo her tiştê ku tên holê, mebestek heye. Dem derbas bû û Bê bû mêşeke zana û xwedî ezmûn. Li derdorê ji gulekê bo gulekî din difirîya og toz berhev dikir

og şîre dimijt. Tevî ku gelek hevalê wî çêbibûn û ji kar û xebata xwe jî hez dikir, lê tu carî ew waneya giring ku wî li jîyanê wergirtibû û hînbibû ji bîr nedikir. Wî fêr kiribû ku di jîyanê de pir guhartin çêdibin û mirov divê ji wan guhartin û serpêhatîyên nû re vekirî be. Bêr pir jîr bû û ew dersa bi mêşên din yê şanêde jî parwe dikir. Wî ji hevalên xwe re behsa serpêhatîya xwe û gula ewil dikir û piştî, çawa karî hevalbendîyek nû bi gula din re jî pêk bîne.

Wî ji hevalên xwe re digot li pey tiştê nû yê xweşik bigerin ku di jîyanê de pir hene û bi tiştê heyî jî qîmet bidin. Li dawîyê de Bêr bibû weke rêberek ji bo mêşên ji xwe ciwantir, ku ji bo cara yekê dest bi kar dikirin. Wî ew fêr dikirin ku çenda giring e ew vekirî bin ji bo guhertinên nû li pêşerojê de têne pêş û ji bo wan kêlîyên biçûkê jîyanê jî rêzdar bin. Wî her waha ew fêrî hevletî û hevkarîyê dikir û digot ka çawan mirov bi hevra kar bike ji bo ku bikare jîyanê xwe

dewlemend û watedar bike. Bêr êdî ne tenê xebatkarekî ji dil bû, ew di heman demê de mamostayek û îlhamderek bû ji bo yên din.

Tevî ku ew berdewam bû li karê û xebata xwe ya jî kulîlkekê bo kulîlkeke din difirîya û toza kulîkan berhev dikir, lê ji kar wêdetir ji xwe ra kêfxweşî û dilaramî jî tê de didît. Ew rêgihîştibû ku jîyanê wateyeke kûrtir heye û ew yek di jîyana xwe de tecrube kiribû û fêr bibû ku bi hemû wan tiştê bedew û binirx ê ku derdora wî hene bi rêzdarî pêre danûstandinê bike.



Arvîn niha 19 salî ye û li zanîngeha bajarê Trondheim, sala destpêkê matimatîk û fîzîk dixwîne.

QIRFO

xanîyên rêkûpêk
hundirî hewşo pakîş
derveyî hawşo qilerî

gelek entel deng kirin
bermayên xwe
di pençerê re avitin

bi mêşan re
pîng pong lîhîst
insên her car kazanc kir

dest avite mîkrafon
wext derbas nabe
derewên ketine dorê

ax westandin
daran
mewê nedan


Seyfî Doğan

BI BEXŞÎNÊ

— TEVLÎ PÊŞEROJA ZAROKAN BIBIN —

DONATIONER

— VARA MED OCH BIDRA TILL BARNENS FRAMTID —



Şarruma û mîrasa ruhî ya çiyayên Kurdistanê berdewam e

Zazê Mahabadî

Şarûma û mîrata rûhanî ya çiyayên kurdan

Arketîpa ji xwedayê çiya ber bi gelê çiya dirêj dibe. Şarruma, xwedayê ciwan ê Panteona hûrîyan, ne tenê xudanê asîman û çiya ye; ew di heman demê de sembola hişmendîya ji çîya çêbûyî, berxwedana dijwar û xwesteka hundurîn a ji bo bilindahiyê ye.

Fîgura wî hêza ga, wêrekiya şêran û geşbûna birûskê di hewîne - mîna berxwedana gelê çiyayî yê kurd li hember xwezayê û çarenûsê.

Berdewamiya mîtolojîk

Nasnameya Şarruma wekî "Xwedayê Çiya" ne tenê sembolek erdnîgarîyê ye ew ajotina hundurîn a mirov ji bo bilindahî, bilindahî û azadîyê temsîl dike.

Di cîhana hûriyan de, çîya textê xwedayan bû, di cîhana kurdan de, ew penageha berxwedanê bû.

Dema ku ev herdu wate digihîjin hev, di navbera Şarruma û çarenûsa gelê kurd de dengvedanek kevnar derdikeve holê: "Çiya mala xwedayan e - lê mirov li wir dibe xweday."

Ji ber vê yekê, wênekirina Şarruma li ser şêr an ga ne tenê sembola hêzê ye, lê di heman demê de sembola kontrola xwezaya xwe ya hov e jî. Ew hevsengîya hebûnîya ku gelek şervan di seranserê dîrokê de pêk anîne tîne bîra mirov: Qehremanî - ne tenê têkbirina dijmin, lê di heman demê de ramkirina kaosa hundurîn e jî.

Paralelîzm bi arketîpa qehremanê kurd re

Di çanda kurdî de, kesayetîya qehreman bo nimûne, Memê Alan, Siyabend, an Şeroyê Biro, hertim bi çîya re tîne nas kirin. Çîya hem welat û hem jî go-

ra van qehremanan e, mîna ku Şarruma li serê çiyê ji dayikbûye û di şer de gihîştiye.

Navê Şarruma (şarri-uma), ku tê wateya "kurê padîşah", di heman demê de bi tezekkirina li ser rêzê bi vegotinên qehremanên kurdî re têkildar e. Qehremanî ne bi xwînê, lê bi karakterê ve tê veguhastin.

Her nifş Şarruma xwe diafirîne. Yê ku hildikişe çiyê, xwe diparêze û li ber xwe dide. Ji ber vê yekê, fonksiyona Şarruma wekî "xwedayek parêzvan" bi baweriya kurdan a bi "parêzvanê çiya", "çiyayê parastinê" (ruhê çiyayê parêzvan) ve girêdayî ye.

Çiya ne tenê erdnîgarî ye, ew celebek hişmendiyê ye. Û ew hişmendî di dilê Şarruma de di her serdemê de şiyar dibe.

Çerçoveya Sembolîk:

Sêgoşeya ezman - jin - çiya

Di teolojiya Hûrî de, sêgoşeya Teşşub (ezman), Hebat (roj/jin), û Şarruma (çiya) hevsengîya dînamîk a gerdûnê temsîl dike.

Ev sêgoşe dişibîhe hevsengîya di navbera enerjîya mêran (êz), berhemdariya jinane (jin), û bêdawîbûna xwezayê (çiya) di folklora kurdî de.

- Teşşub hêz, qanûn û birûsk e ku ji ezmanan derdikeve.
- Hebat ronahiya germî û pîrbûnê ye ku jiyane dide dinyayê.
- Şarruma stûna çiyê ye ku ev her du hêz li hev dicivin - ezman û erdê bi hev ve girêdide, hilgirê rêzîkê

Di vê çerçoveyê de, Şarruma bav û kalê arketîpa "mêraniya destanî" di çanda kurdî de heye.

Ew şer dike lê diparêze, diwar e lê dadperwer e, bêdeng e lê bi dengekî bilind diaxive.

Nirxandina arketîpîk:

berdewamiya ruhê çiyayî

Rawestandina Şarruma li ser şêran ga ne tenê sembola hêza îlahî



Arketîpa wî di kevir, ba û çavê baz ê çiyê de dijî.

ye, lê di heman demê de sem-bola hevpeymaniyek bi aliyê hov ê xwezayê re ye.

Di mîtolojiya kurdî de, heywanên çiyayî (ga, gur û baz) pir caran totemên giyanî yên qehremanan in. Ji ber vê yekê, Şarruma, mîna qehremanên destanî yên kurd, sînorên giyanê xwe bi hêza heywanê berfireh dike.

Ev berdewamîya mîtolojîk rave dike çima "çiyayîbûn" di tevahiya dîrokê de wekî rêyek hebûna di nasnameya kurdî de maye, ne tenê rewşek erdnîgarî.

Şarruma ew neynika efsanewî ye ku mirov bi riya wê vediguhere çiya. Şekilê Şarruma di nav relie-fên kevirî yên panteona hurîyan de cemidî ye, lê ruhê wî di her ser-demê de ji nû ve berdewam dike:

- Di wêrekiya zarokêkî kurd de.
- Di berxwedana roj-ronî ya dayikeke kurd de.
- Di xwesteka gelê kurd a ji bo azadiyê de.

Teşşub li ezmanan diqîre,
Xebat jiyanê dide dinyayê,
Şarruma wê jiyanê diparêze wek ku çiya kurdan diparêzin. Çiya pîrozîya çanda kurdî ye, û pî-rozîya penageha çiyayî ya gelekî şerker e.

Şarruma heta roja îro

Berdewamîya mîtolojîk a pîrozîya çiyayê hurrî di baweriyên kurd; êzîdî û elewiyan de

Cografyaya pîroz a Zagrosê û kozmolojiya hurrî

Li yek ji kevintirîn pergalên baweriyê yên Rojhilata Nêzîk, li herêma çanda Hurrî-Mîtanî, rêzeçiyayên bilind, bi taybetî jî Zagros, weke navendeke kozmîk hatine pejirandin. Di vê pergala baweriyê de çiya, ne tenê pêk-hateyeke cografîk bûn, lê weke erkên pîroz hatine dîtin:

- mala xwedayan,
- warê giyanan,
- deriyê dewranên demsalî, û
- cihê bav û kalan.

• Di navbera salên 3000–1000 bz de, cografyaya bingehîn a gelên hurrî, gûtî, lullubî, sub-artû, kassît û mannaî; Zagros, Colemêrg, Loristan, Hewraman û derdora Wanê bû. Pîrozîya çiya ya vê cografyayê îro jî di hemû baweriyên kurdî de zindî maye.

Şarruma di Pantheonê Hurrî de: «Axayê Çiyayî» û Parêzvanê Kozmîk Xwedayê herî berbiçav ê kozmolojiya çiyayî ya Hurrî Şarruma ye.

Nav û etimoloji

Teonîma Šarruma/Šarrum(a/i) ji du kokên zimanê Hurî hatiye:

- šarri / šarri: “lûtke, bilindî, qral, çiyayê bilind”
- uma / umaš: “parêzvan, xwedî, axa”

Wateya wê eşkere ye: “Axayê Çiyayî / Qralê Çiyayan”.

Cih û ikonografiya xwedê

Šarruma, kurê xwedayê Firtone Teššup û xwedawenda dayik Hepat e. Di piraniya ikonografiyê de weke figurekî ciwan, xurt û parêzvan tê xuyakirin. Li ser bizinekî çiyayî, piling an şêr hatiye teswîrkirin. Ev ikonografî, xwedayekî ku di navbera ruhê çiyayî û civaka mirovî de navberiyê dike, temsîl dike. Relîfên wî yên herî xurt li Yazılıkaya (sedsala 13an BZ) têne dîtin.

Rola xwedayê çiyayî di kevneşopiyên Hurî de

Šarruma bi sê erkên xwe yên bingehîn navdar e:

- Çiya Bi Xwe = Xweda (Kesayetkirina Ruhî): Di ayînên Hurî de çiya, ne tenê cîhek e; ew ruhekî zindî ye, nefes digire, bereket û ceza dide. Šarruma kesayetkirina vî ruhî ye.

• Hêza Apotropîk (Parêzvan):

Šarruma, xwedayekî ku qebileyên û serweran di cografyayên dijwar re derbas dike û wan li dijî dijmin diparêze.

• Xwedayê Dergevan (Lênihêrê

Rêyan): Ew xwedayekî ku li ser rêyên koçeriyê yên dijwar ên Zagrosê ewlehiyê peyda dike û rêberiyê dike, bûye pîroz.

Domdariya Çanda Çiyayî ya Hurî di Çanda Kurdî de

Ayînên çandî û têgihîştina cîhê pîroz a Hurî, di baweriyên Kurdî de domdariyeke dîrokî û etnolojîk a zelal nîşan dide.

Şopên giştî

- Domdariya Zagrosê Weke Cîhê Pîroz: Zincîreya Zagrosê, wek Hewraman, Colemêrg, Şingal, Sîna îro jî stûna dîna ya çanda Kurdî ye. Têgîna “Çiyayê pîroz”, bersiva hişmendiya gel a baweriyaya çiyayê pîroz a ji serdema Hurî ye.

- Veguherîna Xwedayê Çiyayî bo Ziyaretgehê: Kulta xwedayên çiyayî yên mîna Šarruma, di serdema piştî Îslamê de veguheriya kulta ewliya/mirovê pîroz û bûye

Pîr, Ziyaretên Şêxan û Ziyaretê Şêxan.

- Ayîna Agir û Newroz: Di festîvalên biharê yên Hurrî de, agira yekem li lûtkeya çiyê dihat vêxistin. Îro vêxistina agira Newrozê li cihên bilind, nîşaneyê herî zelal a vê domdariya çandî ye.
- Kevneşopiya Kevirê Qurbanî ya Hewramanê: Li Hewramanê, ku di hezarsala 2. BZ de navenda ayînen Lullubî-Hurrî bû, hîn jî kevneşopiyên berhevkerina kevîr, rijandina rûn û hiştina kevîrê qurbanî dijîn. Ev ayîn rasterast domdariya pratîkên Hurrî-Lullubî tê qebûlkerin.

Qadên domdariyê yên taybet

1. Kulta çiyayî û mîrata Şarruma di baweriya êzidî ya kurdî de. Êzidîtî, yek ji kevintirîn tebeqeyên baweriyê yên Rojhilata Nêzîk, pîroziya çiyayî bi hêz diparêze. Çiyayê Şingal (Şengar), ji bo êzidiyan ne tenê cîhek cografîk e, lê weke penagehek pîroz û cihê jidayikbûna pîroz tê qebûlkerin. Ev qebûlkerin, domdariya erkên Şarruma yên parêzvaniyê û warê giyanan e.

2. Kulta Çiyayî û Ziyaretgehên Baweriya Elewî ya Kurdî

Cografyaya pîroz a Elewîtiya Kurdî, bi taybetî li herêma Dêrsimê, yek ji wan deveran e ku mîrata Hurrî herî zêde tê jiyîn.



Çiyayê Şingalê



• Pîroziya Munzurê: Çiyayê Munzurê û derdora wî li Dêrsimê, ne tenê rêzeçiyayek e, lê weke hebûneke pîroz, weke Pîrekî zindî tê dîtin. Ava ku ji Çavkaniyên Munzurê derdikeve, çavkaniya jiyane ye. Ev, îmajeke nûjen e ku tê de baweriya Hurrî ya çiyayê ku bi xwe xwedê ye (ruhê zindî) bi avê ve hatiye konkret kirin.

• Baweriya Xizir û Dergevanî: Baweriya Xizir (Hızır) a ku di Elewîtiya Kurdî de berbelav e, xwediyê erka mîna ya “Xwedayê

Dergevan” û “Parêzvan” a xwedayê Hurrî Şarruma ye. Xizir, di demên dijwar de li çiya û rêyan derdikeve û rêberiyê dîke.

• Ayînên Agirê yên li Cihên Bilind: Ligel Newrozê, di cejnên demsalî yên wekî Qereçûx (Qederçûx) de jî agir li cihên

çiyayî û bilind têne vêxistin. Ev pratîk, bi kevneşopiya vêxistina agir li lûtkeyên çiyayî yên festîvalên biharê yên Hurrî re, domdariyeke çandî ya rasterast nîşan dide.



"Testa genetîkî got bi xudê tu kurd î!"

Mehtab Îdelî

"Enerjiya ku ji wan deran ez dikişandim, her çend bi salan hewl da ku sedema wê bibînim jî, min ew nedît.

Min fehm nedikir ku bavê min her tim çima li min dixist.

Çima bi salan her kesê li taxê bi awayekî ecêb li min dinihêrî?"

Şoreşa genetîkê ya sedsala 21an yek ji keşîfên herî mezin ên dîroka mirovahiyê ye.

Piştî temamkirina Projeya Genomê ya Mirovan, di nav salan de, bi pêşveçûnên teknolojîk, genetîka bi mîlyonan kesan hate nexşekirin.

Encamên ji van daneyên mezin derdikevin, şaşîyên ku bi sedsalan civaka me kirine û têgîna ya nesl û nijad rûreş kirin.

Lêkolînên genetîkê ên herî dawiyê bi awayekî zelal nîşan

didin ku, cudahîyên genetîkî yê di navbera mirovan de li gorî dabeşkirinên nijadî ên kevneşopî nînin.

Berevajî vê, tê dît ku cihê-rengîya genetîkî xudî avahîyek tevlihev e ku ji sînoren erdnîgarî û çandî derbas dibe.

Ev dîtin, bingeha zanistî ya gotarên neteweperwer bi taybetî dixin ber pirsyarê û di heman demê de alîkarîya me dikin ku em tebîeta rastîn a cihê-rengîya mirovan fehm bikin.

Bê guman ev xeletîyên ku derdikevin holê bandoreke mezin li ser jîyana mirovan dikin.

Encamên van testan, di van salên dawî de bi taybetî li ser medyaya civakî, bi awayekî berbiçav tîr niqaşkirin û parvekirin.

Di vê çarçoveyê de, ez jî bi xwe jî rastî çend mînakên balkêş hatim; mirov bi encamên testên genetîkê yê malpereke bazirganî şaşwaz bûne û ev yek bûye sedema nîqaşên kûr ên li ser nasnamayê xwe.

Rokê jinekê li ser malpereke testa genetîkê ji pismamê min ra nivîsîbû û gotibû wê bi testa genetîkê kifş kiriye ku ew bi wî va kuzen in.

Dixwest ku em alîkarîya wê bikin û bavê wê yê dilkî bibînin.

Ji ber ku ez xelkê gundên derdorê çêtir nas dikim, pismamê min hejmara telefonê min dabû wê.

Piştî çend rojan telefon hat - ew jinik bixwe bû û bi dengêkî bi heyecan çêroka xwe vegot.

Digot malbata min li dora Keleha Enqerê dijîyan û her du hêl neteweperestên tirk bûn.

Lê, ji dema ku ez dikarim bibîr bînim, ez her tim bi çanda

Rojhilatê Anadoluyê ra eleqedar bûm. Min bi berdewamî li ser şêwazên jîyana wan lêkolîn dikir. Li dibistanê beşdarî komeleya folklorê Kurdî dibûm û her tim guh dide ser muzîka Kurdî.

Ji ber ku malbat hêrs dibû, min ew hemû tişt bi dizî dikir û veşartî dijîyam.

Hevalê min ê li zaningehê xortekî ji Kobanîyê bû.

Sohbeta me bi pîranî li ser jîyana wan a li wir bû. Min meraq dikir ka wan çi dikir û çawa dijîyan.

Ji min ra bedewiya jîyana xwe ya li Kobanîyê vedigot û digot bi hezaran donim zevîyên me hene.

Gava ez êvarê diçûm odeya xwe, min çavên xwe digirtin û di nav xeyalan de bi saetan pêxas li wan deran digerîyam.

Efsûna wî erdê qedîm, ez bi xwe ra dibirim cîhekî din.

Mîna ku ava Dicle û Firat bi êşa min ra diherikîn û ji min ra dibûn derman.

Ez a li pey wan biçûyama El-Kurnayê, li wir bejna wan wek bûk û zava dibû yek û ew yekîti ber bi Besrayê va diherikî.

Ji Dîcleyê diqarîm; min jî dixwest wek wê bibim bûkeke bedew û dinya ji bo min şer bike.

Dû ra dîsa derbasî Binxetê dibûm.

Awazên dengbêjên Serxetê ber bi aliyê din va dihatin û tevli dengê Mihemedê Seîd axa dibûn. Bi hev ra li ber sînemaya Amûdê zarok disorandin û ez digiriyam.

Çira dibiriqîn û vedimirin û te yê bigota qey teysok distirên.

Min dû ra pêxas xwe diavit nav deşta Mezopotamyayê.

Dema ku birçî bûm, diketim pêsiirên jinên bi deq û deq pê ra şîn dibûn. Û her ku şîn dibûn, gul bi serê xwe geş dibûn.

Piştra, min ji dûr va pîrika bejn bi morî temaşe dikir. Dergûşa min ji nû va dilorand.

Her ku dihejî, diketim nav xeyalan.

Ew xeyal bi salan berdewam kirin.

Bi salan rihê min li cihekî din û laşê min li cihekî din bû. Min dizanî ku tiştê ku ez dijîm ne normal bû.

Wek ku dibêjin, “Xûn ji avê girantir e.”

Girantir bû û hêza min pê nedikir, rihê min her tim ber bi

wan deran va radikişand û dibir. Paşê ez dîsa hêdî hêdî vedigeriyam ser rastîya xwe; rastîya min bi êş bû û min fehm nedikir ku bavê min çima her tim li min dixist.

Kîngê dayika min li mal ne-bûya, ew li min hêrs dibû.

Ez li erdê û birayê min li ser qenepê dida rûniştandin.

Ew li mezringeha goşt û masiyan (Et balik kurumu) dixebitî. Ji boça ga qamçiyek çêkiribû û her carê ku vedixwar, bi wî qamçî li min dixist.

Carinan dapîra min ez dibirrim mala xwe, da ku bavê min bêtir li min nexe.

Her tişt pir zehmet bû û min hewl dida ku fehm bikim.

Tiştê tekane ya min dizanî ev bû: me qet ji hev hez nedikir.

Dema 16 salî bûm ew mir.

Min nikaribû bi rojan şahîya dilê xwe veşêrim.

Merî û meristanên wek min- rastîya çêroka min nedizani- matmayî mabûn.

Çima bav û keçekê ji hev hez nedikirin?

Nizanim çima ez ji ber mirina wî weqas şa bûm?

Piştê wê, min ne rokê ew bi bîr anî, ne jî carekê serdana gora wî

kir. Sal bi ser de derbas bûbûn. Rokê, dema ez sî salî bûm, xaltîya min ji min ra got ku bavê te yê dilkî kesekî din bû.

Ew kesê tu nas dikî ne bavê te bû. Di destpêkê de ez matmayî mam.

Paşê, tiştên ku min jîyanbûn wek filmekî li ber çavê min derbas bûn û min got:

‘Keçê, tu çima matmayî?’

Û dû ra çêroka min a dilkî dest pê kir.

Dapîra min jineke li ser xwe bûye. Dema ku yek salî bûye, dê û bavê wê li Meletîyê ji hêla leşkeran va tên kuştin.

Birayê wê, wê dibe mala eqrebên wan ên li Kirikkale û li wir dihêle.

Dema ew mezin dibe, bi xortekî ji wî gund ra tê zewicandin. Lêblem, ew qet ji mêrê xwe hez nake û her tim li rêyekê ku jê xelas digere.

Rokê cîrana xwe qaneh dike û tev direvin Enqerayê. Dema ku gihîştin îstasyonê, dibînin ku her kes digirî.

Bi matmayî ji kesên derdora xwe dipirsîn ka çi qewimîye.

Ji wan ra dibêjin Mistefa Kemal miriye.

Piştî demeke kurt, li otêlekê dest bi karê paqijkerîyê dikin.

Çend salan şûnda, bi zilamekî ji Kirikkaleyê ra dizewice.

Zarokên wan çêdibin, lê karê otêlan berdewam dike.

Rokê, keça wê pir nexweş dikeve. Ew li şûna xwe kêça xwe ya 16 salî -dayika min- dişîne ser kar.

Dayika min sê mehan li wir dixebite. Di vê navberê de, ew dibe evîndara hesabgêrê çeleng ê otêlê.

Du êvîndar bi dizî hev dibînin. Hevaltîya wan sê mehan didome.

Rokê, dema ku ew ê li parkê (Gençlik parki) hevdu bibînin, dayika min xwanga xwe ya 8 salî jî bi xwe ra tîne.

Xaltîya min li wir bavê min dibîne û tu carî ji bîr nake.

Digot ku xortekî çeleng û dirêj ber bi me va dikenîya û dihat. Didanên wî, ji ber porê wî yê reş û xelek hîn spîtir xuya dikirin.

Dayika te bi dengekî nizm got, ‘Ew e!’

Nêzî me bû, xwişka min bi heyecan rabû ser xwe.

Piştî silavdayîna hev, me dest bi gerê kir. Em bi seatan li dora parkê gerîyan.

Min ew careke din jî qet nedît.“

Pir navber nakeve, rokê bavê min tê ba dayika min û dibêje:

‘Ez ê herim leşkerîyê“.

Herdu jî ji zarok (min) bêx- eber in. Ew dibe hevdîtina wan a dawî.

Xortê ku wê bi tevahîya jîya- na xwe bawerî pê dianî, li bajarê Enqerayê ji ber çavên wê wenda dibe û dihere.

Dinya li ser wê tê hev û bi ro- jan bédeng dimîne.

Piştî ku zikê wê dest bi me- zinzûnê dike, dîya xwe ferq dike û dibe ba doxtor.

Doxtor dibêje ew ducanî ye û zayîn pir nêzik e; zarok yê di de- mek nêzik de ji dayîk bibe.

Dîya xwe dîn dibe.

Bi salan bi dû dikeve ku ev yek kê anî serê wê, lê heta ku mir nikaribe peyvekê ji devê wê bi derxîne.

Hîn jî gotinek ji devê wê derneketiye, heta bi navê wî jî neaniye ziman.

Xeyidiye; li wî, li xwe û li jîyanê.

Ew sir hîn jî li ba wê veşartî ye.

Li roka ku ez ji dayik dibim, ew ji wê taxê bi mêrebîyekî ku

ji wê pir mezintir ra tê zewi- candin. Paşê, çend salan şûnda birayê min çêdibe.

Va ye çêroka min.

Li xwe, li zarokatîya xwe, li bavê xwe digirim.

Tekane wêneyê bavê min ê li ber çavên min, yê ku xaltîya min qala wî dikir bû.

Mîna ku min ew çarçove ki- ribû û li odeya xwe bi darxistibû.

Sî û sê sal in ez pê ra derd û êşên xwe parve dikim.

Ez bi tenê wêneyekî bavê min yê ku vê çarçoveyê tiji bike jî qe- bûl dikim.

Çêroka wê ez xemgîn kirim û şihitandim. Min xwest ku alîkarîya wê bikim.

Paşê min yekser dest bi lêkolînê kir.

Me berê ji otêlê dest pê kir. Navê otêlê çû bû û li ku bû?

Me nav û cihê otêlê êvsî.

Ew pê bawer bû ku otel ew bû.

Otel aîdî Kurdên Hey- manê bû. Ew bi salan bi dizî bûbû şahidê civinên Wargeha Xwendakaran a Firatê (Firat ta- lebe Yurdu).

Dibe ku bingeha DDKOyê û yê kurdayetî li wir hatibûn danîn.

Piştire min lêkolîn kir ka di wan salên şêstî de kurdên ji gundên me yê ku xwadayî û muhasibe dikirin kî bûn.

Ji ber ku wê demê kesên xwande kêmbûn, vê yekê karê me hêsantir kir.

Wekî din, du kesên ji malbata ku me texmîn kiribû, li cihê testa genetîkî bi tesadûfî test kiribûn û ew jî kurê kuzenê wê yê yekem xuya dibûn.

Paşê min du sê kesên ji malbatê -ku wan malbat baş nas dikirin- ra têkilî danî.

Min qala mijarê kir. Texmînen malbatê heman kes nîşan didan.

Kesê texmînkirî, paşê ji hêla kesekî ji malbatê ku li heman otelê dixebitî û şahidê bûyerê bû va hate piştrastkirin.

Piştî xebateke berfireh û analîzeke hûrgulî, me bavê wê dît.

Lê me nekanî wan bînin cem hev. Ji ber ku mixabin bavê wê şeş meh berê çûbû rehmetê.

Digot:

“Testê tenê ew tiştê ku dilê min dizanî, di serê min de piştrast kir.

Piştî ku şêst salîya xwe, aîdiyeta cihê ku rihê min dikişand, min niha difirîne.

Ez serxeşîya kurdbûna xwe dijîm.

Ez bi dizî ji malbata xwe li erebê siyar dibim û bi dengê bilind stranên kurdî guhdarî dikim. Şakîro; favoriyê min e!!

Tu jî alîya min a kurd î!

Çêroka me vegot, nîşan di-de ku zanist pirsgirêkên mezin çareser dike û rastîyên veşartî derdixe holê; lê di heman demê de berpîrsîyarîyên mezin jî datîne ser milê me.

Me li nifûsa kurdan yeka din zêde kir. Bi xêr be!

Pêparîya xwe li serê kesên ku Kurbûna xwe bi dilxwazî an bi bêhemdî wenda kirî be!

Qarîn: Hesûdî kirin.

Sorandin: Aş kirin, hewandin.

Dilkî: Rastî

Pêparîya xwe li serê wan be: Aqûbet li serê wan be.

Hişmendiya bêdewletî – Hişmendîya kolektîf

Professor Hacı Akman

Bîranîna bêdewletî– Bîra kolektîf

"Bîranîna bêdewletî" li ser wê yekê ye ku kurd çawa bîra xwe ya kolektîf tevî nebûna dewleta xwe diparêzin. Lêkolîn nîşan dide ku ji bo kurdan, bîranîn jiber berxwedanê ye, berpirsiyariyek exlaqî û hebûnî ye ku rê nade dîrok û nasname were jêbirin. Bêyî saziyên dewletê yên wekî arşîv, muzexane û pirtûkên dersê, divê bîra kolektîf bi rêya kevneşopiyên devkî, huner, wêje, film û medyaya dijîtal bijî.

Xala destpêkê ew e ku bîr ne tenê takekesî ye, lê di heman demê de civakî û siyasî ye. Li gorî teorîsyenên wekî Halbwachs, Assmann û Nora, bîrên kolektîf bi rêya sazî û sembolan têne afirandin ku nasname û hevgerîtinê didin civakê.

Ji bo kurdan, ku mezintirîn gelê bêdewlet ê cîhanê ne, ev yek rastî dijwarîyan tê. Dewletên ku

ew lê dijîn - bi taybetî Tîrkiye, Iraq, Îran û Sûriye - bi piranî polîtîkayên ku hewl didin zi-



man, çand û dîroka kurdî ji holê rakin, dimeşînin. Ev yek "rejîma jibîrkinê" diafirîne ku tê de kesên li ser desthilatê jibîrkinê wekî çekek siyasî bikar tînin.

Di heman demê de, ev bêdewletbûn bûye sedema derketina holê ya şeweyên alternatîf ên bîranînê. Tradîsyona dengbêjiya devkî wekî arşîvek zindî tevdigere ku stran û çîrok bûyerên dîrokî û trawmayên kolektîf tê de diparêzin. Derbirînên çandî yên wekî wêje û film jî wekî "cîhên bîranîna çandî" roleke girîng dilîzin, ku tê de çanda kevn ji nûve tê bikarnîn û watedarkirin. Dengên jinan di hilgirtin û ragihandina van bîranînan de, hem di malbatan de û hem jî di hunera nûjen de, fonksiyoneke navendî lîstine.

Li dîyasporayê, ev xebata bîranînê berdewam dike. Saziyên kurdî li Ewropayê wekî arşîv û cîhên kombûnê ji bo ziman, belge û şahidiyan dixebitin. Bi rêya projeyên weha, bîranînek kolektîf a transneteweyî tê afirandin, ku tê de nîfşên ciwan trawma

û çîrokên rabirdûyê wekî beşek ji nasnameya xwe digirin ser xwe. Bîranîn, festîval û pîrozbahiyên wekî cejna Nevrozê dibin sembolên civatek bê sînor.

Serdema dijîtal ji bo vê bîranînê qadên nû vekirîye. Projeyên mîna Bernameya Bîranîna Kurdî û Pirtûkxaneya Dijîtal a Kurdî dihêle ku bîranîn bêyî ku li erdnîgarî û astengiyên siyasî binêrin, werin berhevkerin, parvekerin û parastin. Ev yek tiştê ku Akman wekî "rewşek sembolk a bîranînê" bi nav dike diafirîne - civatek li ser bingeha ezmûna hevpar, ziman û dîrokê li şûna axê.

Di dawiyê de, gotar digihêje wê encamê ku bîr ji bo kurdan hem îfadeya man û nemanê ye û hem jî formeka berxwedanê ye. Bi rêya devkî, huner û dijîtalîzekirinê, ew nasname û civaka xwe diparêzin. Bi vî awayî bîranî dibe kiryarek siyasî û hebûnî - sozek ji bo înkarkirina hêza jibîrkinê û parastina gelekî bê dewlet bi rêya hêza bîrê.

Pêşdîtina kronolojîk a bîra kurdî

Prof. Hacı Akman

Bîra kurdî pêşveçûnek ji pratîkên devkî û bedenî ber bi berxwedana dijîtal û navneteweyî nîşan dide. Li cihê ku dewletê hewl da bîranînan jê bibe, kurdan saziyên xwe yên bîranînê bêyî dewletê afirandine - bi şiklê stran, helbest, arşîv û torên dijîtal. Bîr hem wekî stratejîyek zindîmanînê û hem jî wekî xwe-îspatkirina çandî tevdigere, ku "bîranîn" dibe erkek hebûnî: sozêk ji bo newindabûnê.

Tabloya pêşdîtinê

Periyod Dem	Konteksta dîrokî	Şêwazên bîranînê (hişmendiyê)	Bûyer / sembolên sereke	Taybetmendî û girîngî
Demên pêşmodern (berî 1800)	Emiratiyên kurdî; tunebûna çarçoveyek dewletî	Dastan, helbest, dengbêjî, çîrok û çîrokbêjî	Çîrokên lehengiyê, dîroka malbatî, destana Mem û Zînê	Bîra kolektîf û bedenî; nasnameya girêdayî erd, rûmete malbatê û peyda kirina gotûbêjî
1800–1923 (Paşdaçûna dewleta osmanî û dabeşkirina kolonîal)	Têkçûna dewleta osmanî; dabeşkirina hukumdarîyê	Çanda nivîskî ya destpêkê, rojnameyên kurdî û derdorên rewşenbîrî	Kovara Hawarê, nivîsên destpêkê yên neteweperwer	Derbasbûn ji bîra herêmî ber bi bîra neteweyî; hewlên çêkirina dîroka kurdî ya hevpar
1923–1970 (Jêbirina dewletî û qedexeyên çandî)	Peymana Lozanê; parçabûna Kurdistanê; asîmilasyon	Bîra nepenî, û devkî parastinên veşartî	Dersîm 1937, Komara Mahabadê 1946	Bîr dibe siyasî û serhildêr; dewlet hewl dide ku dîroka kurdan jê bibe

Periyod (Dem)	Konteksta dîrokî	Şewazên bîranînê (hişmendîyê)	Bûyer / sembolên sereke	Taybetmendî û girîngî
1970–1990 (Trawma û sirgûn)	Şer, şikestin, û jenosîd (Enfal, Helebce)	Şahîdî, stran, çîrokên sirgûniyê (exîlê) û helbest	Enfal 1988, Helebce 1988, tevgera PKKê	Bîr wekî xemgînî û berxwedan; avakirina civakên dîyasporayê
1990–2010 (Rêxistinbûn û dîyaspora)	Xweserîya li Başûrê Kurdistanê; koçberiya mezintir ber bi Ewropayê ve	Muzexane, rojbûnên bîran, arşiv, rêxistinên dîyasporayê	Muzeya Helebceyê, Pîrozbahîyên Newrozê li dîyasporayê	Bîra bêdewletî: avakirina desthilatdariya bîran li dîyaspora û herêmên xweser
2010–niha (Dijitalîzasyon û bîra transnasîyonal)	Internet, medya civakî, diaspora ya giştî	Arşivên dijital, film, belgesel, çalakiya toran	<i>The Kurdish Memory Programme</i> , Rojava 2014–	Bîr dibe dijital, cihanî û navserdem; wek “dewleta bîran” a sembolîk

Lîteratûr

Haci Akman, “*Statsløs i diaspora: kulturarvdokumentasjon og virtuelt museum*”, Museologisk Tidsskrift, 2009.

Lêkolîn di ser awayên ku mîrasa/bîra kurdî di diaspora de bi mûzeyanê dijital tê sazîkirin.

Haci Akman, “*Monumentalising av diasporaidentitet*”, Tidsskrift for Kulturforskning 6(1–2), 2007.

Lêkolîn li ser çêkirina nasname û bîr di nav diaspora kurdan de.

Kurdistan Memory Programme (KMP), “*Story of Anfal*”.

Nivîsar ku dîtina berfireh li ser kampanya Anfalê (1988) û rolê wê di bîra kurdî de pêşkêş dike.

Adnan Çelik, “*The Rise and Fall of Kurdish ‘Memory Work’ on the Armenian Genocide*”.

Lêkolîn li ser pêşveçûn û guhertina hişmendîya kurdan derbarê qirîkirinê û hişmedîya kolektîf.

Helbest

dunê
zarokên te yê
birçî redikevine
tu jî dizivirî
û di dorê re digerî
daweste
yên ku
mirinîye xulk dikan
û tîryakîyên xaliyên sor in
bibîne
gunehên wanan ku
tarezî nekşîne
kêr nabire
agir naşewitîne
di hembazê xwe da
veneşêre
bi qîrnî ke
banga hêstirkan ke
hewarê zarokên ku
birçîne
ditirsêne
û dengî sîrênan bibihîze
dunê
zarokên te yê
birçî redikevine
çi rind
tu jî dizivirî
û di dorê re digerî

Seyfi Doğan



Rêwîtiya ber bi welatê xerîbîyê*

Adem Özgür

Ter Apel: Gava yekem

Saet piştî nîvro çar bû, baran pir şên dibarî. Gava ez gihîştim navenda penaberiyê ya yekane ya Holandayê (Ter Apel), bi dehan kes li wir bûn ku çente û çalên xwe li pişt xwe girtibûn. Her yek ji wan bi kelecaneke li benda serlêdana xwe ya dawî bû.

Di odeya piçûk a li ber deriyê kampê de, jin û mêrên misrî, zarokên xwe di hembêza xwe de

digirtin û li benda dora xwe bûn. Gava min ji jina ciwan zehmetiya hatina vir pirsî, dudilî bersiva min da: “Eger em cîhên ku jê hatine bidin ber çavên xwe, na, rêya ku em hatin ne zehmet bû.”

Dîwarên hesinî yên kampê, kontrolên tund ên li dergehê, wesayîten polîsan ên ku dewriyê digerin, ev dera mîna zindanekê didin xuyakirin.

Bi qasî saetekê li benda dora xwe mam. Li dorê; sûrî, yemenî, filistinî, somalî û eritreyî hebûn. Piraniya kesên ji Tirkiyeyê hatibûn kurd in.

Expo Assen: Odeya bendewariyê

Piştî sê saetan min serlêdana xwe tevakir. Bi du otobusan em veguhestin bajarê Assenê, qada fuarê. Ev der ji bo kêmkirina barê navenda penaberiye wekî cihê penaberiye ye demkî hatibû amadekirin. Ji bo pênc sed kesan bi konteynerên kartonî hatibû amadekirin.

Li Expayê deng bi hev ketibûn. Qurbanên şer, kesên ku cezayê îdamê lê hatibû birîn, kesên ji zordariya li dijî muxalifan reviyane, kesên ji ber rêgeha xwe ya zayendî di bin gefê de bûn, rojnamevan, nivîskar li vir bûn. Li vir tenê yên ku ji ber nasnameya siyasî penaberî dixwestin tunebûn; yên din jî hebûn. Piraniya wan bi belgeyên sexte hatibûn.

Min bi mêr û jîneka ji Mersînê re heman konteyner parve kir. Ew, deh sal in hevdu nas dikin, ji ber ku malbatên wan li dijî tekilîya wan bûne, revîyane û hatîna Holanda, ew hatin

wek çareya yekane dîtibûn. Ji sînore Bosnayê bi rêyên qaçaxî gihîştibûn vir.

“Tiştên ku di filman de dihatine gotin, çîroka me ye.”

Di serê siwê de min Rojhatê ji Kobaniyê nas kir. Di sih û şeş saliya xwe de porê wî spî bûbû, xwedî nêrînek xemgîn bû. Dema ku bi birayê xwe re hewl dabûn sînore Macaristanê derbas bikin, ji aliyê sivîlan ve ji cendirmeyan re hatibûn îhbar kirin, tundi dîtibûn, leşkeran bi saetan ew di bin baranê de hîştine.

“Gotibûn ku tiştên bi vî rengî di filman de diqewimin. Fîlm em bûn, me bi xwe ew fîlm jiya. Me kut xwarin, em di erdê de hatin kaşkirin, heqaret li me hat kirin, em hatin vegeandin.”

“Te qet fikirî ku vegeirî?”

«Di aqlê me de vege tunebû. Ji ber ku em zarokên xwe difikirîn. Me dîsa û dîsa hewl da û niha em li vir in.”

Vegera Ter Apelê

Di roja pêncemîn de em vegeiryan Ter Apelê. Blokek dane min. Di daîreyeke çar odeyî de hatim bicîhkirin. Metbex, tuwa-

let û serşok hevpar in, her der pîs bû. Her roj piştî nîvro saet sêyan xwarin dihat belavkirin, bi gelemperî di bin barana dijar de rêzên dirêj çêdibûn.

Li vir bi sedan kes hebûn; Eritre, Tîgrayî, Efxanî, Fasî, Yemenî, Sûrî, Tûnisî... Hin bi vîzeyê, hin bi gemîyan derya derbas kiribûn, hinan ji wan lêdan xwaribûn, hin jî tevî ku hatibûn paşve şandin dîsa hewl dabûn û gihîştibûn Holandayê.

“Tirkan li her derê ji me nefret dikir”

Muhammedê Sûrî yê ku ez bi wî re li heman daîreyê dimam, bîst û heşt salî bû. Yanzdeh salan li Tirkîyeyê jiyabû, li restoran û avahîsaziyê kar kiribû. “Me gelek xebat kir, lê me pereyên xwe bi temamî nedistand. Me tirkî evisî, bi devokên me qerfên xwe dikirin.”

“Tirkan him li wir ji me nefret dikirin him jî naxwazin em li vir bin,” got Muhammed û dewamkir: “Eger ew ji penaberan aciz in, çima ew bixwe li vir in? Welatê wan, pereyên wan û rêveberiyên wan hene.”

Gava min bi Servetê ku

xwediyê kargeha tekstîlê bû re dengdikir, min dîmeneke cuda dît. “Welatê me ketiye ber destê wan,” wî got. Gava min got, “Rewşa we ya niha jî dişibe vê,” gotina min bi dilî wî nebû û ew hêrs bû: “Erê, lê em ne mîna wan in. Tu niha me bi wan re yek digirî?”

Dîyarê neh salî

Dîyar ji Kobanî ye, neh salî ye. Di sala ku êrişên DAIŞê dest pê kiribûn de ji dayik bûye, zarokekî hîperaktîf e. Bi apê xwe yê bîst salî re ji Kobanî ber bi Tirkîyeyê, ji wir ber bi Spanyayê, paşê jî ber bi Holandayê ve hatine.

“Heta ku em werin vir, me pir zehmetî kişand, lê qet ne-tirsiyam,” got. “Dema em ji Kobanî derketin, diya min ez teme kirim, ‘guh bide apê xwe, zêde deng meke,’ got. Ez ewqes bêdeng mam ku niha pir deng dikim!”

“Dema tu mezin bibî, tu yê çi bikî?” min jê pirsî.

“Qaçaxçitiya mirovan. Di vê karê de pereyên zêde hene, lo!”

Ez şaş mam...

Haarlem: Keştiya Penabera

Piştî îfadeya polîsan, ez veguhestim Haarlemê. “Mala min a nû” keştiyek bû, navê wê jî Prens Virginia ye. Di du keştiyên ku li kanalê hatibûn girêdan de nêzîkî du sed penaber dijiyan. Qamaraya min teng e, tenê du ranzayên duqatî û maseyek piçûk tê de cih digirt.

Min li keştiyê Mike ê ji Tîgrayî naskir. Çil salî bû, xwedî karekerekî şermok û bêdeng bû. Bîst û pênc meh bû li keştiyê dimîne. Li Tîgrayê dema wekî rojnamevanekî muxalif kar dikir hatibû girtin, kamera û notên wî hatibûn desteser kirin.

“Bavê min dema ez li vir bûm hat kuştin, malbata xwe difikirim û xwe diparêzim,” got û dewamkir: “Dûr bûn, venegerî tişteki zehmet e. Ji ber vê yekê ez hewl didim li vir bi kesî re şer nekim. Ji ber ku nîqaşeke herî piçûk dikare bibe sedema redkirina proseya min û ez nikarim ji malbata xwe re pêşerojeke baş peyda bikim.»

Dilovanê Efrînî jî bîst û du salî bû. Di heşt saliya xwe de ji Efrînê çûbû Stenbolê. Di neh saliya xwe de li kargeha tekstîlê

dest bi xebatê kiribû. Ji sînorê Tîrkiye-Yewnanistanê bi peyatî, ji Sirbistan, Macaristan, Slovakya re gihîştibû Holandayê.

“Min bîra Stenbolê, kolanên Beykozê kir,” got. “Ma di navbera me de bimîne, min bîra vexwarina rakî jî kir.”

Çîroka min

Çîroka min ji ya wan cuda bû. Ez ne di nav şer de bûm ne jî bi kuştinê dihatim gefxwarin. Lê dema ez hê deh û heşt salî bûm, nivîsa min a bi navê “Li Tirkiyeyê Kurd Bûn” bû sedema tengasiyê.

Sibeheke zivistanê, li gundê me yê li Qonyayê bi dehan leşker xuya bûn, ez hatim girtin. Nikarim ji bîr bikim ku leşkerek hat ber deriyê nezaretxaneyê, çek ber bi min ve dirêj kir û got: “Eger ez te vê êvarê li vir bikûjim, kî dikare min ji vê yekê bigire?”

Dadgehê biryara girtina min da. Di odeya bi navê Tecrîd-1ê de heft meh û niv derbas bû. Ji du dozan bîst meh ceza dane min.

Ji wê rojê heta niha şazdeh sal derbas bûn. Ji ber nûçeyên

ku min nivîsandin gelek lêpirs-
în hatin vekirin. Çûyîna derveyî
welat hat qedexekirin, pasaporta
min hat desteser kirin.

Sirgûn ji bo min ne têgeheke
nû ye. Çîroka min, dema ku
kurd ji Kurdistanê ber bi çolên

Anatolîya Navîn hatin sirgûn
kirin dest pê kiribû. Tevî sê sed
salan, em ne ji wir in û ne jî niha
li vî welatê xerîb xwedî cih in.

Jiyana li welatê xerîbîyê bi vî
awayî berdewam dike.

***Xelata rojnamegerîyê**

Ev nivîs, wekî kurteya nivîsa Adem Özgür e û di hejmara 183'yan a 1+1 Expressê de bi sernavê “Rêwîtiya Ber Bi Welatê Xerîbîyê” (Welatê Xerîbîyê’ye Yolculuk) hat weşandin.

Nivîsê, di 32. Xelatên Rojnamegeriyê yên Musa Anter û Şehîdên Çapemeniya Azad de, di kategorîya nivîsên tirkî de xelata yekemîn girt. Di beşa tirkî de, endamên juriyê Banu Güven, Faruk Bildirici, Alî Duran Topuz, Candan Yıldız, Nezahat Doğan û Mehmet Alî Çelebî bûn.

Jurîyê ev daxuyanîya belavkiribû:

“Adem Özgür bi nûçeya xwe ya bi sernavê ‘Rêwîtiya Ber Bi Welatê Xerîbîyê’ karekî girîng û zehmet li qadê çekiriye. Wî çîroka xwe bi çîrokên cîhanê û tevgera koçberiyê ya cîhanê re girêdayî nivîsandîye. Ev nivîs bi zimanekî sade û bê ajitasyon hatiye nivîsandin. Di dawîya nivîsê de jî hişyarekî edîtoryalî ya xurt heye. Ji ber vê yekê, karê Adem Özgür wekî kurdekî ji Tirkiyeyê, him ji bo navê Musa Anter û him ji bo nimûneyên baş ên rojnamevaniya Tirkiyeyê û him jî ji bo rêbazên cîhanê yên pîşeyê, karekî lajiq û biqîmet pêşkêş dike.”

Yek bo min yek bo te

Şefîq Pêşeng

Li seranserê welatê me, bi taybetî li bajarê me yê me ew weke *paytext* an jî *Parîsa Rojhelatê* binav dikir, roj tune bû ku ciwan derneketina kolanan û bi polis û Hêzên Ewlekarîyê re şerê bikeviran nekiran.

Piştî îneke di bin çavdêriya Hêzên Ewlekarîyê de, Zubeyr derxistin pêşberî dadgehê. Jiber doza wî û ya çend kesên dinê yên



di eynê rojê de ji heman sedemê hatibûn girtin, bi hev girêdabûn, Zubeyr ne bi tenê bû. Bîst-bîst û pênc tawanbar, deh -diwazdeh parêzerên kesî nizanibû kî, kê diparêze û gelek ehlên girtîyan, salona dadgehê tijî kiribûn.

Ku Zubeyrê li her du kêlekên wî cendirmeyek hebû, kete hundir, weke siyasetmedarekî dikeve civîneke hîlbijartinê, her du destên xwe ji kesên di salonê de re hejandin û heta cendirmeyekî ew mecbûrî rûniştinê nekir, li ser nîga ma. Heta kêlîya şandeya dadgehê kete hundir, Zubeyr bê navber geh li paş xwe, geh li milê xwe yê çepê an yê rastê dizîvirî, silav dida wî an wê kesa ku hîç nas nedikir.

Axirê şandeya dadgehê kete salonê, weke her kesî, lê beriya her kesî Zubeyr rabû ser nîga, pişkoka çakêtê xwe girt û bi serê xwe silav da dadwer û li ser nîşana dadwer, li cîhê xwe rûnişt.

Dadwer kêliyê li dosyeya ji gelek rûpelan pêk dihat, nêrî û navek xwend. Xortekî nûgihastî rabû ser xwe, piştî sê çar pirsan, dadwer biryara girtina wî da. Paşê navekî dinê. Ew jî hatibû girtin. Yê sêyem jin bû. Dadwer zêde dirêj nekiribû û piştî sê-çar pirsan, ji bo wê jî biryara girtinê dabû.

Yê çaran Zubeyr bû. Zubeyr mêrekî qut, qalind, navmilê wî fireh, sînga wî weka sînga berana bû. Destê wî yên ji lepên hirçekê mezintir, cîh li ser maseya pêşîya wî nehiştibû.

Zubeyr bi xwendina navê xwe rabibû ser nîga, hemî pişkocên cakête xwe girtibûn û li benda pirsê dadwer sekinîbû. Piştî îşareta dadwer li ser kursiyê rûniştibû. Pirsê pêşî ya dadwer, pirsê standart bû, ji yên pêşîya Zubeyr jî pirsî bû, ji wî jî pirsî:

Tu beşdarî xwepêşandaneke neqanûnî bûyî? Çi dibêjî?

Zubeyr, pêrpêre bi pirsê bersiva dadwer da:

Ez beşdarî xwepêşandaneke neqanûnî bûme?

Belê!

Got, dadwer.

Ezbenî, Xwedê li jor e û şa-

hid e! Ez ku di emrê xwe de beşdarî xwepêşandaneke qanûnî nebûme, ez ê çewa beşdarî yeka neqanûnî bibim?

Yanî tu beşdarî xwepêşandanê nebûyî?

Gotê, dadwer.

Qanûn, qanûn e Ezbenî! Em bi saya qanûnan dijîn. Ma ez ê çewa tiştêkî bêqanûnî bikim?

Bi dengekî jixwebawer got, Zubeyr.

Dadwer ji nav dosyeyê sûretek derxist, pêşîyê bi xwe lê nêrî, nîşanî yên kêleka xwe da, paşê nîşanî Zubeyr da û ji bo hemû beşdar bibînin, ew bilind kir. Sûret ji xwepêşandanê hatibû kişandin û Zubeyr jî bi zelalî xuya dikir.

Zubeyr li ser pirsê dadwer, carekê kuxiya û got:

Belê Ezbenî! Xwedê li jor e û me dibihîze, loma jî ez nikarim derewan bikim! Jixwe di dînê me de jî derew guneh e. Ew kesê di sûret de helbet ez im. Lê ez rica dikim, ka li sûret binêrin. Ez li herî paş im. Mesele weha bû; Ez li dikana xwe bûm. Qelexbalixek di ber dikana min re derbasbû. Jixwe her roj tiştên wisa dibin. Min hîç li wan jî nenêrî. Nizanim

çi dixwazin? Dayika zarokan hat, li Xelîl pirsî. Xelîl xulamê we be, lawikê me ye. Diwazdeh salî ye. Piçek jî aqilsivik e. Ji malê derketiye. Min ji hevalên wî pirsî. Gotin daye pê wê qelebalixê. Aha, ez jî ji bo li wî bigerim û wî ji nav wanpêxwasan derxim, min da dû wan.

Dadwer sûretekî dinê derxist, ew bilind kir û bi dengêkî tinazker pirsî:

Ê di vî sûretî de li herî pêş kî ye?

Ez im, Ezbenî. Min lawê xwe, xulamê te be! lawikê li ber dilê min pir şîrîn, birayê sê xwişkan, li paş nedît, di navîn de nedît, ji mecbûrî çûm pêş lê bigerim.

Gotê, Zubeyr.

Yanî tu ji bo li lawê xwe bigerî, tu li wê yî?

Xwedê li jor e, tenê ji bo lawikê xwe ji nav wan derxim!

Gotê, Zubeyr. Dadwerê ku berçavka wî heta girêka bêvila wî şemitibû, ji nav dosyeyê sûretekî dinê derxistibû û hêj li sûret dinêrî got:

Te ji bo bavêjî polîsan kevir jî berhev kirine!

Çewa dibe, Ezbenî? Ez çewa keviran bavêjim polîsên em canê xwe, malê xwe, namûsa xwe

dispêrên wan? Ma ez dîn bûme, li ber dewletê dest rakim?

Naxwe ev kevir çi dikin di dest û birikên te de?

Gotê, dadwer.

Tu behsa evan kevirên di destê min de dikî, Ezbenî?



Got, Zubeyr. Li yên salonê, li parêzeran nêrî û paşê berê xwe da dadwer:

Rica dikim baş li sûret binêre, Ezbenî! Binêre, kevir di destên min de ne û destên min li paş min veşartî ne. Min dît ku gede keviran berhev dikin û diavêjin polîsên me. Ji bo kevir nekevin destê wan û ew wan navêjin

polîsan, min ew berhev kîrin!

Pişkîniyek bi yekî ji salonê ket, lê bi lez çend caran li ser hev kuxiya û dengê xwe birî. Dadwer carekê berçavka xwe ku her dişemitî û berjêr dadiket, derxist û ew careka dinê xist çavê xwe.

Li gorî diyardeyên bidestketî te kevir avêtine polîsan!

Got, dadwerê bi Sebra Eyûbî di dosyeyê de sûret ji hev vediqetandin. Zubeyr li benda pîrsa dadwer nesekînî û got:

Ezbenî, Xwedê li jor e û dizane, ez ê çewa heqê polîsên me bixwim! Dema ez ji bo şuxlekî diçim devereke û zarokên xwe bi tenê dihêlim, ma kî wan diparêze? Ma ne ev polîsên ku nîzam û pergala wan dimeşe? Ma çavên min kor bûne ku ez keviran bavêjim wan?

Dadwer tişteke negot, sûretek derxist û ji bo her kesê di salonê de bibîne, ew bilind kir.

Tu çi dibînî di vî sûretî de? De ka bêje me!

Got, dadwer. Zubeyr gavek ber bi sûretê bilindkirî ve avêt, qenc lê nêrî û bêyî zêde bihizire, carekê jî li salonê zîvirî û got:

Ku hûn baş li sûret binêrin, hûn ê bibînin ku polîs li milê min î rastê ne. Min dît ku gedeyê

kevirên destê wî xilas dibe, çav be-
ra kevirên di destê min de dide û
li dora min diçe û tê, min ji xwe
re got; <Divê ev kevir nekevin
destên van gedeyan>. Taliyê du ji
wan hatin û xwestin bizorê kevi-
ran ji min bistînin. Yek ji wan pîr
mizawir bû. Gote min; <Xalo ku
tu wan keviran navêjî polîs bide
me!> Min got a baş ez van kevi-
ran bavêjim devereke dût, bira
nekevin destê gedeyan. Min wisa
kir ku him kevir li polîsan nekevin
û him jî nekevin destên gedeyan!

Ën salonê li himber bersîvên
Zubeyr şaş û mat mabûn. Dadwer
sûretekî dinê derxist, ew bilind kir
ku her kes bikaribe wî bibîne. Di
sûret de Zubeyr weke ku cengek
qezenc kiribe destê xwe yê rast
bilind kiribû û bi tilîyên xwe jî
nîşana serkeftinê kiribû.

Te bi tilîyên xwe nîşana
Rêxistina Terorîst jî kiriye. Tê ji vê
yekê re çi bibêjî, Zubeyr Efendî?

Bi dengê bihêrs, got dadwer.
Dadwer cara pêşî navê wî gotibû.
Jê re Efendî jî gotibû.

*Xwedê li jor e! Ezbenî, ez ne
rêxistina terore nas dikim û ne
jî nîşana wê. Ezbenî, min dît
ku camêrek sûret dikşîne. Dema
sûret dikşand, min bi destê xwe*

nîşana <du>yan kir. Yanî min gotê;”Bikşîne, duyan bikşîne, yek bo min, yek bo te!”

Dadwer û şandeya dadgehê şaş û matmayî, kêliyeke ne dirêj bi hev şêwirîn. Dadwerê serokê şandeyê bihêrs li çavên Zubeyr nişan da û got:

Berdin, bira biçe, lê careke dinê bi ber çavên min mekeve!

Zubeyr careke dinê destên xwe ji yên li salonê hejdan, bêyî dirêj bike bilez ji salonê derket û dema ji deriyê dadgehê derket, gotinên;

Ma kî dikare careke dinê min biqefile û bîne vir! got û ji wê bidûr ket.

Têbini: Wêne bi alkariya KI hatine çêkirin.

AGAHDARYEKE GIRÎNG

Em dixwazin di her hejmareke kovarê de, serpehatî, çîrok, metelok û kilamên ji aliyê we hebin ji kovarê re bişînin. Herwiha ji cil û bergên kurdên Anatoliya Navîn wêneyekî kevn jî di Bîrnebûnê de biweşînin. Bi vî awayî em ê hem bi tevgirêdana kurdên Anatoliya Navîn bizanin, hem jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çi awayî ne.


Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatoliyê didin zanîn ku: wêneyên kesên ji malbatê (jin–mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmanciyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopiyekê bi rê bikin. Bi vê yekê em ê bi dewlenediya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr bînin.

Redaksiyon



Xemên sar

ez destvala hatim dinyaya fanî
û destvala diçim axîretê
ez ne mişextê xerîbîstanê me
mîrata xerîbiyê konê hesretê
di rayên canê min de vegirtiye
ne tîrêjên stêrkan herikîn nava min
ne jî di bin peşkên barana payîzê de şilopilo bûm
ji hemû baweriya olên pîroz hatim qewitandin
kul û keserên demên bêoxir ez bi saxî kuştim
li nav qelebalixa kolanên biyanî
bi tena serê xwe sergêj digirim
bîranînên jibîrbûyî
di binhişiya ramanên kûr de
dengvedidin şevên lal
di hêsirên çavên bêxew de xeniqîn
dilê mesûm
li nav pençeya tenêtiya bêdeng
diperpîte
masiyên gola temenê jar
ji tîna behecîn
hehecikên giyanê xeydok
şeveder man
ewrên hinavê kelegirî xemên sar
dibarînin
cîh û warên nediyar ji min re bûn
goristaneke bêkes
gotinên nerm
di gewriya ziwa de bûn gilokek
hişk û vnebûyî



tayên porê demsalên xumrî spî bûn
dergûşa helbestên derengmayî
di malzaroka şevên avis de
teperep e
li jiyana bêwefa min gelek êş û tirs
kevn kirin
arezûyên şêrîn li ber bayê felekê
tarûmar bûn
hesûdên çavbirçî rûkeniya tava berbangê
ji awirên melûl dizîn
perdeya dilê hezkirin û bêrîkirinê
veçirandin
kirasê endîşe û gumanên reş
li bejna keskesora xeyalên ronî
pêçandin
dilpakî
nefsbiçûkî
û xweşbînî
rawestgehên dilovaniya min in
ez ê
bi gavên lez ber bi rojên geş ve
bibe zim
şewqa çireya hêviyên vemirî
biçirisînim
toza kîn û nefretê li ser çemên zelal
daweşînim
ji tasa kaniya bihuştê
şereba eşqa Îlahî vexwim
û li kêfa sermestiyê bibim destmala
şahî û govenda ferîşteyên nûranî

Xizan Şîlan

DÎROKA HUNERA TEVNÊ, XALÎ Û KURD


-IV-

Muzaffer Özgür

XALÎ

Welatê xalî raçandinê li bakûrê dinyayê, navbera 30-45° da ye. Li rojhelat kulav, li rojava jî xalîyên bi gire hatinî honandin tên bi kar anîn. Di bin 30° de dinya germ e û însan hesir bi kar tînin. Jor 45° jî sar e û post bi kar tê. (K. Erdmann, *Der Orientalische Knüpfteppich, Tübingen-1955*). Dema me va ahagdariya K. Er-

Bi kurdî nav kirin; xali, xalî, xalîçe. Farsî; q/kalî, q/kalîçe ji zimanê Pehlewî têyê. Pehlewî, Farsî û kurdî di nav koma zîmanan de nezi hev in û dibe ku ji hev girtibin. Di vir de tîpa q, k, x dengên nêzî hev didin û ev di zimanên Aryan da her dem heyê û cîh didin hev. Li gor zimanzana binavkirina xalî ji koka



dmann, li ser bakurê dinyayê bi berpan (enlem) û berbejn (boylam) nîşan da, ev ahagdarî derdikevin holê.

kalîn a pehlevî tê û tê mana raçandin, kêlîm, cêrax e. Lê, bî tirkî halî gotin bi nav kirineka xerîbe, tê gotin ku ji van zimanan hatîye girtin.

Di zimanê tirkî de kelîmeyên bi tîpa H tunen. Di dema selçûkiyan de derbasî zimanê tirkî bûyê. Gotineka din a nivîskarên tirk jî heye; „*bi farsî gotina kalî ji koma tirk a kalaç tê*“, ew li gor zimanzana ne raste. Di pîranî bi zimanên din jî bi nav kirin ji tapîs, tapes a Frîg a têye (Tap, Teppich, uyd.).

Xalî bi gotineka din tê maneya ax ê. Ax, erde û însana di cîh û warê tê de dijîn de ax tapisîne-dûzkirine, wargehên xwe hîn xweşik avakirine. Lê, mamoste Îkram Îşler di pirtûka xwe de nivîsandîye ku *“di kurdî de; lêker a tapisandin heyê. Tepkirin jî gotina rêxistinê dide.”* Bi van gotina bi şunde bi kurdî nav kirina xalî, xalî, xalîçe cîhe xwe digire û raste. Lekolînavên tirk ji ber ku ma zimanê kurdî bi nav nekin qet behsa zimanê kurdî nekirine û di nivîs anjî pirtûkên xwe de behsa kalî ya farsî kirine û nivîsandine ku tirkî halî ji Kalî ya farsî girtîye.

Xalî, jî bo li ser erdê ku were rûniştin, dijîn tê rêxistin. Ji bo dîwarên mal û koşka bixemilînin tê bi dar de kirin. Pîranîya xalîya bi hirîyê te raçandin. Bi gireyên qut û di hev de, bî nexş, rengîn, cêraxên qaling in. Xalî, bi ben (rîs) ê hirî, filik, hevrişim û pêmo te honandin. Di

tevnê de bi vê rêzê te raçandin. Benê hatî amade kirin bi teknîka gire kirinê, di hevde re tê derbas kirin û gire dibe û tê birîn. Ji her rêza girê bi şunde masûr di nav hevde re ser û bin re tê derbas kirin. Dagir paş de tê kişandin dû re jî bi kîrkît tê tapisandin (lê tê xistin). Bî vê şiklê raçandin çêdibe. Li dawîya çend rêzên raçandinê gire bi meqesê tînan birîn û qalingbûna xalî tê dayîn. Benê bi hirîyê ji bo ku saxleme pir hatîyê bi kar anîn.



Çend alavên xalî raçandinê

Wek cêrax, balîf, mînder, xalîyê ji bo xemilandina dîwaran, cîla hespa, têt, secade tê raçandin. Gelên koçber ji ber ku barkirin û birin-anîna xalîyan nezehmet bûye gelek bi kar anîne. Di destpêkê de însana ji bo jîyana xwe xweşik bikin bi kar anîne lê li dawîyê xalî raçandin bûye kulturek a bilind. Gundîya xalîyên raçandine di kon, mal û konaxên xwe de bi kar

anîne. Firotna ev hunera bilind di destpêkê de tunebûyê. Di salên pêş de bûye alav a bezirganîye.

Dîrok li ser ev alavê hunerê çi di-bêje? Li ku? kîjan gelî cara yekem xalî raçandine? Li ser van pirsra lêkolînvan, dîrokzan, antropolog, arkeolog û nivîskar di nav gelek nîqaşan de ne. Lêkolînvanên tirk dinivîsîn ku ev huner di dîroka tirk de destpêkirîye. Faris dibêjin, na! ew hunera me ye. Li ser xalî û hunera wî, li welatên Avrûpa gelek pirtûk û lêkolîn hatine kirin û me agahdar dikin. Bi mejûyê „hertişteki bi me destpêkir.“ Zanistî nabe û em kurd nikanin bi agahdarîyên veng bawer bikin. Min di bêş ên derbasbûyîn de behsa dîroka raçandine kiribû û bi çend mînakên jî xwesti bû zelal bikim.

Dîroka xalî raçandinê gelek kev-nare. Li Rojhelata Navîn û Asyaya Navîn de di nav gelên bi pêz re mijûl in pêş ketîye. Ji ber ku bi hezar sala Rojhelata Navîn bûyê qada şer û pêvçûnan gel û hunera wan nezî hev, tev û hev bûne. Carcaran jî bi destî zorê karmend û zana hatine girtin, revandin, sirgûn kirin û wek xulam hatine bindest kirin.

Gelek mînak hene lê, êz dixwazim du mînaka ji bo ev sirgûn û revandinê bidim. Dema erîşa mongolan li ser

welatên gelên Aryan bû, ew talana kirine. Maritz di pirtûka xwe de nivisandîye û em agahdar kirine. „Di dema Cengîz Xan (1155-1227) de hunermend û karkerên destkarîye hatine girtin û birine Mongolîstanê. Resmekî vê mînakê sembolîze dike li pirtûkxana netewî ya Parîs ê de heyê.“

Mînaka duyemîn jî di dema Osmanîya de bidim. Paşeyê Osmanîya Siltan Kanûnî di sedsala XVI. de axa safavîyan (Kurdîstana rojhelat heta başûr) zept dike. Ji erdnigarîya bindest kirî de zanê û hunermend teslîm girtine û bi xwe re anîne Anatolîyê. Wan hunermendan di welatê Osmanîyan de bingehîya xalîyên navdarên yê bajarê Uşakê ava kirine û wan li dinyayê cîhekî paye bilind girtîye (Anskl. Îslamê).


Gelo niha li dû du mînaka; xalîyên lî Asyaya Navîn hatin honandin bi hunera xwe, yên mongol anjî yên gelên tirk in? An jî hunera pir bi pêş ketî ya xalîyên Uşakê yên Osmanîya anjî ya tirkî ye? Ev bersiv gereg bi mejûyekî însanî, zana û akademîk were dayîn. Lê nivîskarên tirk çawa kirine? Ew gotin qet nêvisandine, her tişteki bûye yê wan?! Na, hîn jî bersiv û gotin hene.

Şopên dîrokê bi folklor, efsane, hekat, çîrok, stran, ol, xêz kirin,

nivîsandin, alavên bi rêya arkeolojîye hatine dîtin tên zelal kirin. Nivîskar Îzady di pirtûka xwe de nivîsandîye; “nîşanên rast yê xalîyên bi pirç dema qiralê Asurî Şalmaneser 3. (BZ.858-824) de bi kêl ê reş (kara dikilitaş) destpêdike. Di vir de du xalî yê bi rîsik (saçak) hatine resm kirin. Cil û bergên kes ên van xalîya digirin nîşaneyê kevnara cîhê qiralîyeta Mitanîya hatîyê ava kirin e û ew der kurdîstana rojavaye. Ew kes ji cil û bergên wan têne nasîn ku giredayî Asurîyên rojava ne.”

Li rojhelat, rojhelata navîn û li rojava ji bo xalî raçandinê sê şiklên gire anjî girê tên bi kar anîn. Ez li ser raçandina xalîyên li hindîstan û çine tu gotina nakim. Di lîteratûra xalîyan de bi nav kirina van gira jî,


- Girê Senneh (Senne)-Gira Îran a
- Girê Gördes (Ghiordes)-Gira Tirk a
- Girê Arebî-Îspanî



Ji ber ku li welatê me û doralîyê wê du girên xalî raçandinê hatine bi kar anîn ez dixwazim li ser van çend goştin û dîtinên xwe binivîsîn.

Girê Senne; Navê xwe yê din jî girê îranê ye. Senne/h, Sanandaj li kurdîstan a rojhelat bajarekî kurda ye û bi sedsala ye li vî bajarî xalî tên raçandin û ew bi nav û deng in. Ji ber ku welatê kurda bindeste û di nav cimata welatên NY. de tune yê ew bajar li ser welatê îranê tê hesibandin û girê jî li gor çoxrafyayê ne, li gor hebûn û nasandina welatekî hatîye bi nav kirin. Bûye girê îranê. Ya rast girê Senneh gir a kurda ye. Xalî raçandina li erdnîgerîya gelê Aryan de pîranî bi girê Senneh in. Di nav kurda de ji dervayî girê senne ya ghordes jî tê bi kar anîn. Li ser girê senne tu gengeşî di lîteratûra xalî raçandinê de tunen.

Çend nivîskar û lêkolînvanên tirk dinivîsin ku kurd, tenê gira



Girê Senne/h

tirka gördes bikar tînin. Ew ne rast e. Gelê kurd di raçandina xalîyan de her du şiklên girê bi kar anîne.



Girê Gördes; Navê xwe yê din jî girê tirk a. Bi gotina nivîskar, lêkolînan û zaneyên tirk, ev bi nav kirin ji navê bajaroka Gördes têye. Tê gotin, xalî raçandin li bajaroka Gördes ê di sed-sala xıı de destpêkirîye û di sed-sala xvıı an de gehîştîye asteka bilin. Rast e li vî bajarokî xalîyên baş hatine honandin.

Bजारok a Gördes jî li rojava ya tirkîyê ye. Hatîye nivîsin ku di dema Îyoniyê de hatîye ava kirin. Pê re digotine Gordus, Körtes. Dû re ketîye bîndestên farsa, mêkadon, roma, bîzans, selçûkî, osmanî û tirkîyê. Di dema kevna de bi nav kirina Gördes, ghordes li Anatolîyê gelek cîh û war a hatîye bi kar anîn.

Agahdarîya tê zanîn, di arkeolojîye de hatîye dîtin ku ew gire 2500 sal in heye. Çima navekî din ne? Gördes?

Dema min ji rehmetî Dr. Cemşîd Bender re name dişandin, min got; „Bi nav kirina gir a Gördes şaş e. Ez ê li ser vê lêkolîna bikim. Ji ber ku bajaroka Gördes bajarekî biçûk e û di dîrokê de tu hebûna xwe nehatîye nasîn. Nîşanên xwe jî qet tunen. Navê bajaroka Gördesê yê berê Gordûs e lê bi nav kirin a gira Gördes ê bi şaşitî hatîye nav kirin, tevlihevî heyê. Bi nav kirina vê girê Pazyryk, Asya, Saka an jî navekî din dibû. Lê bi nav kirina Gördes ê de pirs û şaşitî hene. Ez ê li ser vê te agahdar bikim. Gotinên Gördes, Gordîon, Ghordones, Gordîonos, Gord bi de ser hev ka çî derdikeve.“ Rehmetî di pirtûk a xwe de ew pirs nivîsand.

Xalî raçandin di dema Osmanîyan de gehîştîye asteka bilind û birç, koşk, mal û xanî xemilandine. Ji ber vê jî lêkolînan di bin tesîra dewlemendîya wan de mane û ew nav lê kirine, ew şaş e. Ez ê niha



Girê Gördes/Ghodes

ji we re eşkere bikim. Rastîyeka xwe jî bînim ziman, dema min bersiva vê pirsê di çend pirtûkan de dît ez gelek keyfxeş bûm. Serîyê min zelal bû û min ji çend lekolinvanê tirk re nivisand û ew dîtin eşkere kir. Qet kefa wan ji gotinên min re nehat. Bersiva wan bi gilower ew bû. “Lîteraturâ xalî raçandinê hatiye amade kirin û ew nav hatiye lê kirin. Kes ên wek te dijminatîya me dikin û meydanê şêlî dikin.”

Ji xwendevanên hêja yê kovara me re mînakekê binivîsînim. Di dîrokê de dema meriv behsa girê dike çi tê bîra me? Girê masîvan a hene, girê behrvanîya / keştivanîya hene, girê bindest kirin û însan kole kirin û pê dest û ling girêdan hene, girê ber sê darê hene... Ew çend mînak in, lê girêyek heye ku di dîrokê de bûye efsane û bi hezar sal in tê ziman, li ser wê pirtûk, tablo, belgefilm hatine amade kirin, ew gire ji erdnîgerîya Anatoliye ye GÎRÊ GORDÎON.

Gordîon paytaxta welatê gelê kevnar ê Anatoliyê Frîg a bûye û cîhe xwe li Anatoliya Navîn nêzî Polatlîyê ye. Ji bo ku agahdariya berhevkim min li Polatlîyê mûzexana kevneşopîyên Frîg an zîyaret kir. Çend motivên hêja jî dîtin. Di bês

ên pêş de ez ê çend tiştan binivîsînim.

GÎRÊ GORDÎON, efsane ye û Arrîanûs di pirtûka bi nave “Annabasis Alexandrî-Sefera Îskêndêr” nivîsandîye. Li Anatoliya Navîn, lî welatê frîg an mezinê gelê frîg li qiralekî digerin û ji bo pirsê çareser bikin serî li berbêjekî (kahîn) welat dixin. Berbêj ji wan re gotîyê; “gereg, kesê cara siftê bi erebeya ga (qangi-ri, gangilî) hatî bajêr wek qiral were qebûl kirin.”

Li gor vê gotinê; rojekê gundîyê belangaz bavê Mîdas, Gordîos bi erebê xwe ya ga giran giran tê bajêr û ew li ber derîye bajêr bi şênazî tê silav kirin. Ew dibe qiralê gelê Frîg. Qiralê nû erabê xwe dîyarî perestgeha Sabazîos dike. Wê bi dara sorsorîk (kizilcik) di dîwarê perestgehê bi girê kor gire dikin. Dihatiye gotin ku kesê vê girê kor bikanê veke diba xudanê erdnîgerîya Asyayê!

Dema Îskêndêrê (Alexsandrê) Mezin, bi armanca Rojhelata Navîn û Asyayê bindest bike derdikeve seferê, tê bajarê Gordîonê (BZ.334). Dibîze ku gotineka li ser girê Gordîon heye û daxwaz dike girê ji hev veke, pir li ber xwe dide lê nikane. Sebra xwe xelas dibe, eciz dibe û şûrê xwe dikşîne û pê girê dibire.



Tabloya Giovanni Paolo Paninî (1691-1765) bi nave "Îskêndêrê Mezin û Girê Gordîon"

Ew heta Hindîstanê tere û hemû welatan bindest dike lê, di cîwanîya xwe de dimire. Gotinek heye ku Îskêndêrê Mezin ji ber bê sebirbûna xwe mirîyê û negêhiştîye armanca xwe.

Ev navê Girê Gördes ji girê Gordîon teyê. Rastîya wê Girê Gordios/ Gordîon e. Giovanni Curatola di pirtûka xwe de nivîsandîye, "Sistema tevnê ya tirk nave xwe ji Gördes girtîye. Li vir tê gotin ku Îskêndêrê Mezin girê gordîonê ya navdar vekirîye" (rûpel: 16). Bi vê gotinê derdikeve hole ku şaş hatîye fehmkirin û şaşkirineka mezin heyê. Tu eleqa bajaroka Gördes a tirka, bi bajarê Gordîon a frîg an, anjî bi nave qiral Gordîos tuneyê.


Mînaka duyemîn jî îzady dide me, ".....sîstema binavkirina girê li welatên rojava, bi şikleka kevneşopî

û ecêb şaş bi nav kirina girê Ghordes û Sîne tên nasîn.

Çend gotinên din en li ser vî navî, di sed sala duyemîn a PZ. de di Atlasa Ptolemaîos (Batlamîûs) de hatîye nivîsandin û nîşan kirin ku çîyayên Gordionos (çîyayên kurda) li Kurdîstana Bakûr'in. Dîrokzan Strabon (BZ.63-PZ.23) nivîsandîye, "Gordîan li rojhelata Babilê ye. Li bakûr çêmê Firat, li aliyê din Komma-gene heyê. Ji van çîya re çîyayên Gordîan tê gotin. Dicle, girêdayî bajaroka kevn Gordîan e. Kardûkîya bi navê Sarîsa, Satalka Pînaka bajarên xwe hene." Gelo bi van navkirinên min li jor nivîsandin; Gördes, Gordûs, Körtës, Gordîon, Ghordones, Gordîonos, Gordîan, Gord nêzî çî ne? kê ne? gotin ji kîjan zimanî tê ye? Li gor êtîmolojîya pêyva tîp ên g/k cîh didin hev! Gord dibe kord/kurd. Ne ûsa?



Bi munesebeta bibîranîna Dr. Mem Xelîkan me wek weşanxaneyê APECê nivîsên Mem Xelîkan yê li ser çand û folklorê kurdên Anatolîya Navîn ên kovara Bîrnebûnê de hatine weşandin wek: *kilamên me, stranên gelêrî, helbest, kurteçîrok, hevpeyvîn, gotinên aqilmendan* û çend nivîsên ku li ser Mem Xelîkan hatine nivîsîn, bi rêzgirtineka mezin bi navê *Kuliyata nivîsên Mem Xelîkan* weşand. Ev kitêb kitêbek ji dil û hestên yek mirovekî rastî ye; kitêbeka li ser edeb û merivbûna kurdî, û belgeyek li ser ku çawa meriv bi hêsanî, bi sadebûnî, dikare dilê şexs û civakê bîne ziman. Ev kitêp ji nivîsên Mem Xelîkan ku ji hejmara Bîrnebûnê ya yekê da heta 93an hatine nivîsîn, pêk tê. Bi rêzgirtineka mezin em vê kitêbê bi navê *Kuliyata nivîsên Mem Xelîkan* pêşkêş dikin: ew kesên ku ji mirovên rast û durust hez dikin, ji nivîsên samîmî û ji dil hez dikin, ji helbestên weka ava jîyanê û zimanekî malê hez dikin, bêguman ew ê ji vê kuliyatê jî hez bikin



Romana nû ya **Dehşivar** li ser jiyana belangaz a Bedran e, ku di qonaxên cûda re derbas dibe û bi hewes li aramî û bédengiyê digere. Bedran, ku jê re Bedo jî tê gotin, ku di dema bêmalbûnê de tê behs kirin, li bajarê Dîyarbekirê digere, bi bermahiyên xwaringehan dijî û di bin xirbeyên ku cîh û derfet hene, dûrî gel, radizê. Ji ber ku ew zêde naxwe, xwarin kêm peyda dibe, jê ra ne xem e, lêbelê ew gelek av vedixwe.

Ew tevahiya rojê digere, tiştên ku ew difikire hêja ne berhev dike û wan li hin deveran bi çend quruşan difroşe.

Bi demê re, ji ber gerandina xwe ya li bajêr û kêmtir xwarin dixwar pir zirav bibû. Ji ber vê yekê jê re dibêjin Pînokîyo ...

Mehmed Dehşivar di sala 1959ê de li Êlihê çavên xwe ji dinyayê re vekirîye û ta salên 1980ê jî li wir jîyaye.

Piştî cûntaya leşkerî derketîye derveyê welêt û li Swêdê bi cî bûye.

Wî li vir li Unîversîteya Stockholmê beşa înstîtuya sîyasetzanîyê û pêwendîyên navneteweyî xwendîye.

Niha li daîreyeke wezaretê kulturî ya Swêdê kar dike.

Kitêbên kurdî yê dersê ji weşanxaneya Apecê



<http://apecpublishing.com>

Besöksadress

Mjölmarstigen 1-3


S-163 41 Spånga

Telefon

08-761 81 18

E-post: info@apectryck.se

DONATIONER
— VARA MED OCH BIDRA TILL BARNENS FRAMTID —
ALÏKARÏ
— TEVLÏ PÊŞEROJA ZAROKAN BIBIN —



TÊKILÏ / KONTAKTA OSS
Mjölmarstigen 1, 163 41 Spånga,
Stockholm, Sweden

E- mail: info@stiftelsenkan.com

Hevkarên me / Våra samarbetsparner



Folkuniversitetet Gävleborg
Drottninggatan 10, 803 20 Gävle



ABF Botkyrka– Salem
Hallunda